# Belgeya Stratejîya Neteweyî ya Kurdistanê

**Boçi ev belge:**

Têkoşîna di navbeyna hêzên Kurdistanê û dewletên kolonyalîst da gihiştîye qonaxeke nû. Ev pêşhatine, tifaqa navxweyî ji her demî zêdetir elzem dike. Heta îro ji bo vehûnandina yêkitîya neteweyî gelek kar û xebat hatine kirin, gav hatine avêtin, lê mixabin ku heta nihe jî platformeke ku "bila istisna" hemû hêzên neteweyî bîne nik hev pêknehatîye. Piştî tecrubeyên tahl yên demên borî, îro şuûra yêkitîya neteweyî di bîr û hizira xelkê Kurd da bilind bûye û xelkê me vê yêkê li ser milê pêşengên polîtîk ferz dike. Di roja îro da, doza Kurd û Kurdistanê hewcehîyeke jîyanî bi yêkitîya neteweyî heye. Êdî di navbeyna hêzên neteweyî da avakirina zemîn û kanalên dîyalogê karekî zerûrî ye. Divêt zemînekî ku hemû hêzên neteweyî pêkve girêdide rojek zûtir bête ava kirin. Digel vê yêkê, norm û rêzikên ku pêkve hêzên neteweyî li ser berjewendîyên neteweyî girêdide jî divêt bêne tesbît kirin û di jîyana pratîk ya polîtîka neteweyî da bêne serdest kirin. Bi vê armancê, em wekî KNK, vê "Belgeya Stratejîya Yêkitîya Neteweyî" pêşniyar dikin ku di bîr û rehîya giştî ya neteweyî da bi berfirehî bête axivtin, gotûbêj û riberiz li ser bête kirin û encameke di xêra neteweyê Kurd da bête bi destxistin.

**Statuya dagîrî û kolonyal ya Kurdistanê:**

Kurdistan kolonîya navneteweyî ye li rojhilata navîn. Digel nîrê kolonyalîzma dewletên Tirkîye, Îran û Sûrîyeyê ya li ser stuyê xelkê Kurd, çar parçetî jî dewam dike. Neteweyê Kurd di bin destê van dewletên dagîrker û kolonyalîst da ye û ji hemû mafên xwe yên neteweyî û demokratîk hatîye bêpar kirin. Herweha bi dereceyên ji hev cuda jî be, li seranserê Kurdistanê, polîtîka şer, îmha û inkarê bi israr têtê domandin.

Parçeyê di nav tixûbên fermî yên Iraqa nû da, formekî nû wergirtîye: Di nav Iraqa Federal da, Kurdistana Federal. Lê belê, reftar û pozisyona hukûmeta Iraqa Federal ya merkezî ya "de facto" "antî Kurdistan" ji bo doza bi giştî ya Kurdistanê û mafên neteweyê Kurd, di nav xwe da potansîyela tehlîkeyê disitirîne. Lewma di vî warî da jî divêt hişyarîya neteweyî bilind bête girtin.

**Di "stratejîya neteweyî" da pozisyona dînamîkên navîn û derve:**

Bi seferberkirina pêkve hêzên neteweyî û têkoşîneke bi rê û metodên meşrû yên polîtîk, rizgarkirina Kurdistanê û azadkirina neteweyê Kurd û xelkên Kurdistanê ji bindestê dijminên dagîrker û kolonyalîst manaya "stratejîya neteweyî" îfade dike. Di tesbîtkirina "stratejîya neteweyî" da xala bingehîn û tayînker "berjewendîyên demokratîk yên neteweyî" ne.

Bi navê xelkê Kurd û kêmanîyên dî, hemû organîzasyonên sosyo-polîtîk [civakî-sîyasî], sosyo-kulturel [civakî-çandî] û sosyo-ekonomîk [civakî-aborî] yên neteweyî, kesayetîyên polîtîk û ronakbîr, "wekî hêza mezin ya neteweyî", terkîba civakî ya "stratejîya neteweyî" pêktînin.

Hêzên navneteweyî jî, polîtîkên xwe yên li ser Kurdistanê,"dîrekt" an "îndîrekt", li goreyî berjewendîyên xwe yên jeostratejîk di rê dibin. Li ber vê rastîyê, divêt balansa reel polîtîka cîhanê li ber çavan bête girtin û ji bo xizmeta berjewendîyên neteweyî û aştîya rojhilatanavîn, hisaba "tifaqên piralî" bête kirin.

**Pozisyona dewletên dagîrker:**

Dewletên dagîrker li goreyî berjewendîyên xwe yên dewletî, dijî hevdu di nav rekabet û rikeberîyê da ne. Belêm li ser xalekê berjewendîyên wan hev digirin û bi hev ra hereket dikin. Ew jî Kurdistan û bizava neteweyî ya xelkê Kurd e. Dewletên dagîrker hem yêk bi yêk polîtîkên xwe yên dijî neteweyê Kurd pêktînin û di rê dibin, hem jî bi hev ra û bi koordîne polîtîkên xwe yên hevpar yên dijî Kurd û Kurdistanê di pratîkê da bi cih tînin.

**Pozisyona neteweyê Kurd û xelkên Kurdistanê:**

Dijî vê konsepta nû gelek normal û heq e ku dînamîkên neteweyî jî divêt di çarçoveya



www.arsivakurdi.org

berjewendîyên neteweyî da bi hev ra û bi koordîne hereket bikin. Karekterîstîkên ”parçeyî” hêj bi timamî ranebûne, lê zeîf bûne. Digel hindê, dewletên dagîrker van tixûbên di nav xwe da, dijî bizava neteweyî ya xelkê Kurd dibezîne. Divêt hêzên neteweyî yên Kurd jî beramberî vê polîtîka nû ya dewletên dagîrker, xwe li ”tixûbên destkir” negirin, tixûban bibezînin û piştevanîya hev bikin û di şkandina vî cepheyê dagîrkeran da, bi rengê enîya neteweyî têkoşînê bidin. Karekterîstîka nû ya şoreşa Kurdistanê ev e û divêt li goreyî vê konsepta nû bête hereket kirin.

Li milê dî, neteweyê Kurd di nav proseseke şoreşê da ye. Karektera şoreşa Kurdistanê neteweyî û demokratîk e. Neteweyê Kurd dijî van dewletên dagîrker, li milekê şer û têkoşîneke neteweyî dide, li milê dî jî di nav civata xwe da ji bo bi cih kirina sîstemê demokratîk xebatê dike. Di vê konsepta neteweyî da, bask û çeperên dînamîkên şoreşa neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê fireh in. Hemû çin û navçîn, grûb û kategorîyên civatê yên dijî sîstemê dagîrker û kolonyalîst, di armanca şoreşa neteweyî da tifaqdar in. Armanca ku hemûyan digihîne hev; rizgarîya Kurdistanê û azadîya neteweyê Kurd e. Di vê armancê da cihê kêmanîyên dî yên Kurdistanê, [Asûrî, Ermenî, Cihû, Ereb, Tirkmen, Azerî û Tirk] jî heye. Ew jî tifaqdarên neteweyê Kurd in û azadî û rizgarîya wan jî bi azadî û rizgarîya neteweyê Kurd ve girêdayîye. Lewma dijî vî sîstemê hov yê kolonyalîzmê, divêt pêkve xelkên Kurdistanê bêne seferber kirin û organîze kirin. Berjewendîyên wan hemûyan di hilweşandina sîstemê kolonyalîst da yêk e û divêt di nav esprîya cephegirîya neteweyî da hev bigirin û hêzên xwe bikin yêk.

**Biryara mafê çarenivîsa neteweyî:**

Di merheleyên şoreşê da, li goreyî rewş û konjonktura navxweyî û ya derve, li goreyî hêz û şiyan û îmkanên neteweyî dikare ihtimalên kêm zêde ji hev cuda derkevine pêşîya bizava neteweyî ya xelkê Kurd û Kurdistanê. Mafê neteweyê Kurd e ku biryara ”tayînkirina çarenivîsa xwe” bi xwe bide. Eve dikare otonomî, federalîzm, konfederalîzm û serxwebûn be. Di têkoşîna bidestxistina van armancan da, mafê xelkê Kurd heye ku her reng parastina rewa bi kar bîne. Xelkê Kurd herwisa di têkoşîna azadî, wekhevî, dad û dadyarîyê da terorê red dike û bi hemû peymanên navneteweyî yên mafên mirovî ve girêdayîye.

**Di têkoşîna neteweyî da pozisyona stratejîk:**

Hêz û dînamîkên neteweyî divêt di van xalan da beramberî hevdu bi biryardarîyeke bilind berpirsiyar bin:

1. Berjewendîyên neteweyî yên demokratîk divêt di serê her tiştî da bêne girtin.
2. Hebûnên neteweyî divêt bêne parastin û lê xwudan derkevin û rêz li sembolên neteweyî bête girtin.
3. Di têkoşîna dijî dewletên dagîrker û kolonyalîst da, li ser hisaba rêxistinên dî yên neteweyî divêt nekevin nav hisabên teng û rêxistinî.
4. Digel rêxistinên neteweyî her bi çi rengî be di nav dîyalogê da bin.
5. Piştevanîya hêzên neteweyî di dereceya herî bilind da bête ragirtin.
6. Kerkûk û hemû tixûbên Kurdistanê beramberî dagîrkeran her bi çi metodî be bi hev ra bêne parastin.
7. Şerê di navbeyna hêzên neteweyî da, wekî sûcê neteweyî bête qebûl kirin.
8. Her kîjan hêza neteweyî li ser têkçûna hêzeke dî ya neteweyî bikeve nav pratîkeke şaş, divêt wekî alarmeke sor bête qebûl kirin û beramberî vê ji rêya neteweyî derketinê, hemû dînamîkên neteweyî di nav alarmê da bin û refleksa parastina berjewendîyên neteweyî bi rengekî aktîv û lêveker nîşan bidin û rê li ber şkestina navxweyî ya neteweyî bigirin.
9. Ji bo ku yêkitîya neteweyî ya demokratîk mayînde bibe, divêt organîzasyonên wekî meclis, platform, kongre û yên dî bêne pêkînan.

**Kombûna mezin ya KNKyê ya II.**
**(Civata giştî ya 8an)**
**24 Hezîran 2008, Bruksel**

*Not:Ev belge, di Civata Giştî ya 9. ya KNKyê ya di 13-14ê Kanûna 2008ê li paytextê Belçîk Bruksela hatîye kirin da, hatîye qebûl kirin.*

www.arsivakurdi.org

# Peymana Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê

**Destpêk:**

Em nûnerên partî, rêxistinên siyasî, civakî, roşenbîr û kesayetîyên welatparêz yên Kurdistanî ku bi mebesta avakirina dezgeheke bilind ya Kurdistanî, ji bo parastina berjewendî û yekîtiya neteweyê Kurdistanê, di roja 26 Gulan 1999 de li hev kom bûne û vê peymanê îmza dikin.

**Statuya dagîrî û kolonyal ya Kurdistanê:**

Kurdistan kolonîya navneteweyî ye li rojhilatanavîn. Digel nîrê kolonyalîzma dewletên Tirkîye, Îran û Sûrîyeyê ya li ser stuyê xelkê Kurd, çar parçetî jî dewam dike. Neteweyê Kurd di bin destê van dewletên dagîrker û kolonyalîst da ye û ji hemû mafên xwe yên neteweyî û demokratîk hatîye bêpar kirin. Herweha bi dereceyên ji hev cuda jî be, li seranserê Kurdistanê, polîtîka şer, îmha û inkarê bi israr tête domandin. Parçeyê di nav tixûbên fermî yên Iraqa nû da, formekî nû wergirtîye: Di nav Iraqa Federal da, Kurdistana Federal. Lê belê, reftar û pozisyona hukûmeta Iraqa Federal ya merkezî ya ”de facto” ”antî Kurdistan” ji bo doza bi giştî ya Kurdistanê û mafên neteweyê Kurd, di nav xwe da potansîyela tehlîkeyê dihewîne. Lewma di vî warî da jî divêt hişyarîya neteweyî bilind bête girtin. Kurd yek netewe ye, ku bi pêvajoyeke dîrokî û li ser bingehê yekîtiya niştiman, ziman û çandê li Kurdistane peyda bûye. Ew ji bo rojên azad û çetir, xwedîyê hesta neteweyî, hevî û daxwazên hevbeş e. Bab û bapîrên Kurdan li Rojhilata Navîn di avakirina şehristaniyê de xwediyên paydariyeke eşkere ne. Kurd, bi dirêjahiya dîrokê re bûne xwediyên çend dewletên ku di bin navên cuda de peyda bûne. Herwisa bi dehan Mîrnişîn jî, navçeyên Kurdistanê ava kirine. Paşê di sedsala bîstan de bûne neteweyekî perçiqandî û ji hemû mafên xwe yên rewa bi taybetî jî piştî dabeşkirina Kurdistanê, di navbera çar dewletan de, bêpar mane. Vê jî Kurd naçar kirin, ku dest bidin hemû rêyên xebatê, ji bo arastina nasnameya neteweyê we. Ligel hemû felaketan jî, gelê Kurd ji bilî Ereb, Tirk û Farisan yek ji çar gelên sereke yên Rojhilata Navîn e.

**Rewşa gelên Kurdistanê:**

Li Kurdistanê, kêmanîyên Asurî-Suryanî-Kildanî, Ermenî, Cihû, Ereb, Tirkmen, Azerî, Tirk û Faris jî hene. Ew jî hevparên neteweyê Kurd in. Azadî û rizgariya wan, bi azadî û rizgariya neteweyê Kurd ve girêdayî ye. Lewma dijî vî sîstemê hov yê kolonyalîzmê, divêt pêkve xelkên Kurdistanê bêne seferber kirin û organîze kirin. Berjewendîyên wan hemûyan di hilweşandina sîstemê kolonyalîst da yêk e û divêt di nav esprîya cephegirîya neteweyî da hev bigirin û hêzên xwe bikin yêk.

**Pozisyona dewletên dagîrker:**

Dewletên dagîrker li goreyî berjewendîyên xwe yên dewletî, dijî hevdu di nav rekabet û rikeberîyê da ne. Belêm li ser xalekê berjewendîyên wan hev digirin û bi hev ra hereket dikin. Ew jî Kurdistan û bizava neteweyî ya xelkê Kurd e. Dewletên dagîrker hem yêk bi yêk polîtîkên xwe yên dijî neteweyê Kurd pêktînin û di rê dibin, hem jî bi hev ra û bi koordîne polîtîkên xwe yên hevpar yên dijî Kurd û Kurdistanê di pratîkê da bi cih tînin.

**Helwesta li hemberî dagirkeran:**

Dijî vê konsepta nû gelek normal û heq e ku dînamîkên neteweyî jî divêt di çarçoveya berjewendîyên neteweyî da bi hev ra û bi koordîne hereket bikin. Karekterîstîkên” parçeyî” hêj bi timamî ranebûne, lê zeîf bûne. Digel hindê, dewletên dagîrker van tixûbên di nav xwe da, dijî bizava neteweyî ya xelkê Kurd dibezînin. Divêt hêzên neteweyî yên Kurd jî beramberî vê polîtîka nû ya dewletên dagîrker, xwe li ”tixûbên destkir” negirin, tixûban bibezînin û piştevanîya hev bikin û di şkandina vî cepheyê dagîrkeran da, bi rengê enîya neteweyî têkoşînê bidin. Karekterîstîka nû ya şoreşa Kurdistanê ev e û divêt li goreyî vê konsepta nû bête hereketkirin.



www.arsivakurdi.org

**Biryara mafê çarenivîsa neteweyî:**

Di merheleyên şoreşê da, li goreyî rewş û konjonktura navxweyî û ya derve, li goreyî hêz û şiyan û îmkanên neteweyî dikare ihtimalên kêm zêde ji hev cuda derkevine pêşîya bizava neteweyî ya xelkê Kurd û Kurdistanê. Mafê neteweyê Kurd e ku biryara"tayînkirina çarenivîsa xwe" bi xwe bide. Eve dikare otonomî, federalîzm, konfederalîzm û serxwebûn be. Di têkoşîna bidestxistina van armancan da, mafê xelkê Kurd heye ku her reng parastina rewa bi kar bîne. Xelkê Kurd herwisa di têkoşîna azadî, wekhevî, dad û dadyarîyê da terorê red dike û bi hemû peymanên navneteweyî yên mafên mirovî ve girêdayîye.

**Ji ber vê yekê;**

Gelê Kurd ku hejmara wî nêzîkî 45 milyonî ye û di dirêjahiya dîrokê da, li ser axa xwe jîyaye, ji destpêka sedsala bîstan ve bindest û dabeşkirî bûyê û ji mafê diyarkirina çarenivîsa xwe bêpar maye. Ev yek li dijî peymanên navneteweyî, peyama gerdûnî, yên mafên mirovan û hemû prensîb û qanûnên navneteweyî û xwezayî ye. Ji bo bidestxistin û bikaranîna mafên çarenivîsî û parastina nasnameya neteweyî û yekitîya niştimanî, em vê peymanê radigihînin û eşkere dikin ku em bi vê yekê bi agahdariya cihanî ya mafên mirovan, bi peymanên navneteweyî, peyamên gerdûnî û prensîb û qanûnên navneteweyî ve girêdayî ne.

## BEŞA YEKEM:
## Kongre, Kurdistan, Gelên Kurdistanê, Mafên Sereke û Mafên Serwerîyê

**Bend 1: Kongre**

a. Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê, ku ji niha û pê ve di vê peymanê de bi navê "Kongre" tê binavkirin, bilindtirîn dezgehê Neteweyî ye; ji nunerên partiyên siyasî, sazî û rêxistinên civakî, çandî û dînî yên Kurdistanî, herwisa ji kesayetiyên serbixwe, bi mercên ku ew hemû vê peymanê bipejirînin pêk tê.

b. Îrade û berjewendiyên xelkên Kurdistanê çavkanîya desthilatîyên vê kongreyê ne, ku li ser bingeh û prensîbên demokratîk tê damezrandin.

**Bend 2: Kurdistan û Gelên Kurdistanê**

a. Kurdistan, ew welat e ku li ser erdê wê Kurd, bi hemû dîn, dînza, zarav û devokên xwe yên cuda ve dijîn. Ew, ji wan hemû navçeyên bi hev re girêdayî ne ku piranî ji Kurdan pêk tê. Kurdistan yek welat e û parçekirina wê jî ne xwezayî ye.

b. Guhartina demografîya Kurdistanê bi derxistin û bi zor koçkirina her Kurdistanîyek ji her navçeyên Kurdistanê, herwiha anîna xelkên dî û bicihkirina wan di van navçeyan de, ji aliyê dewletên dagîrker ve, karekî ne rewa ye û bi hîç şêweyan naye pejirandin.

c-Gelên Kurdistanê ji van yên jêrîn pêk tên:

**Neteweyê Kurd**

Neteweyên Asûrî-Suryanî-Kildanî û gelên dî yên Kurdistanî wek Ermenî, Tirkmen, Ereb, Tirk, Cihû, Azerî, Faris ku li Kurdistanê xwedîyê hebûneke dîrokî ne û xwe Kurdistanî dihejmêrin.

**Bend 3: Mafên Bingehîn**

a. Gelên Kurdistanê hemû wekhev in û bi hîç awayan, di warê regez, ziman, dîn, dînza, bawerî, jin, mêr û di derfetên civakî de cudahî di navbera wan de nayê kirin.

b. Zimanê Kurdî zimanê fermî yê Kurdistanê ye.

c. Yên ne Kurd in, lê beşek ji gelê Kurdistanê ne, mafê wan heye ku taybetmendîyên xwe yên etnîkî biparêzin, bi awayekî azad û serbest ziman û devokên xwe pêşbixin, bi hêz û geş bikin, herwiha rêxistin û dezgehan ji bo pêşxistina çanda xwe ava bikin û bi rê ve bibin.

d. Li ciyên ku piraniya xelkê wê Asurî-Suryanî-Kildanî ne, digel zimanê Kurdî zimanê Asurî-Suryanî-Kildanî jî zimanê fermî ye. Herwiha neteweyên dî jî xwedîyê vî mafî ne.

e. Hemû xwedîyên dîn, dînza yên Kurdistanî dikarin wacibên xwe yên dînî, ayînên xwe bi awayekî azad, bi cih bînin, sazîyên xwe yên dînî damezrînin.

www.arsivakurdi.org

**Bend 4: Mafê Çarenivîsê**

Gelê Kurd mîna hemû gelên cîhanê xwedîyê mafê çarenivîsa xwe ye.

(Guhertin, 23.08.2000 Civîna Duyem)

Herweha Neteweyê Asûrî-Suryanî-Keldanî jî xwedîyê mafê çarenivîsa xwe ye.

## BEŞA DÛYEM: Prensîbên Giştî, Armancên Kongreyê û Pozîsyona Stratejîk

**Bend 5: Prensîbên Giştî**

a. Kongre, peyama cihanî ya mafên mirovan, prensîbên mafên çarenivîsî û peymana Neteweyên Yekgirtî ku ev prensîb pejirandine, ji bo xwe dike bingeh.

b. Di terkîba endamên KNKyê de, wekhevîya cinsiyetî heye. Ev prensib, di hemû xebatan, hemû komisyon û komîteyan da li ber çavan tê girtin.

c. Dabeşkirina Kurdistanê li dijî îrade û daxwaziyên gelê Kurdistanê çêbûye û mafê diyarkirina çarenivîsa gelê Kurd bin pê bûye.

d. Berjewendiyên sereke yên gelên Kurdistanê ji hemû berjewendiyên parçe û partiyên siyasî yên Kurdistanê bilindtir in.

e. Bi hîç sebebî nabe ku, partî, rêxistin û kes li dijî berjewendiyên neteweyê Kurd, piştgirî û hevkariyê bi dewleteke dagîrkerê Kurdistanê yan bi dewleteke dî re, bikin.

f. Kongre, hemû cureyên hevkarîya bi welatekî dagirker yê Kurdistanê re, ya li dijî bizava azadîxwaz ya neteweyî, sûcê neteweyî dizane.

g. Kongre, şerê di nava partî û rêxistinên Kurdistanê de red û tawanbar dike.

h. Tu partî, rêxistinên siyasî û kes nikarin dest ji hîç parçeyên Kurdistanê berdin.

**Bend 6: Armancên Kongreyê**

a. Kongre, ji bo bihêzkirina giyanê hevkarî û hevxebatê di nav parçeyên Kurdistanê de, li ser bingehê yekîtiya neteweyî û berjewendiyên sereke yên xelkê Kurdistanê dixebite.

b. Kongre, bi komkirina partî, rêxistin û kesayetiyên niştimanperwer yên Kurdistanê di çarçoveya vê dezgeha neteweyî de, nunertiya gelê Kurdistanê dike.

c. Kongre, hewl dide ku kêşeyên navxweyî û hemû şêweyên nakokî û dijayetiyên di nav partî û grubên siyasî yên Kurdistanî û alîgirên wan de çareser bike.

d. Kongre, hewl dide ku, kêşeyên navbera xelkên Kurdistanê û welatên cîranên wî bi rêya aştî û dostaniyê çareser bike.

e. Kongre, her reng şiddetê red dike, parastina rewa qebûl dike.

f. Kongre ji ber realîteya civata Kurd û Kurdistanê ya paşvemayî, di hemû kar, xebat û organan da ji bo jinan prensîba „diskrîmînasyona pozîtîv“ qebûl dike û bi cih tîne.

g. Kongre, piştgiriya xebata rizgarîxwaz ya neteweyî ya Kurd, li hemû parçeyên Kurdistanê (Tirkîye, Îran, Îraq, Sûrîye) dike û pêşkêşkirina her alîkarîyeke pêwîst, ji bo çareyeke siyasî erkê xwe dizane.

h. Kongre, mîna nûnerê gelê Kurdistanê li ser asta dezgeh û rêxistinên navneteweyî û cîhanî, ji bo bidestxistin û parastina berjewendiyên wê, xebat dike û ji bo vê armancê, ligel rêxistinên siyasî yên Kurdistanî hevkariyê dike.

i. Kongre, hewl dide ku dostanîya di nav gelê Kurdistanê û gelên Ereb, Tirk, Faris û hemû gelên cîhanê de bihêz bike.

j. Kongre, piştgiriya parastina azadî û serbestiyê ji bo hemû dîn, dînza, bîr û bawerîyên li Kurdistanê ne, dike.

k. Kongre, ji bo nûvejîn û geşkirina ziman û çanda Kurdî hewl dide.

l. Kongre, ji bo bicihkirina aştiyê li herêma Rojhilata Navîn û cîhanê hewl dide, herwiha her bi çi navî bin li dijî hemû bîr û bawerîyên nijadperestî û tundrevîyê xebatê dike.

**Bend 7: Di têkoşîna neteweyî da pozisyona stratejîk:**

Hêz û dînamîkên neteweyî divêt di van xalan da beramberî hevdu bi biryardarîyeke bilind berpirsiyar bin:

1. Berjewendîyên neteweyî yên demokratîk divêt di serê her tiştî da bêne girtin.

www.arsivakurdi.org

2. Hebûnên neteweyî divêt bêne parastin û lê xwudan derkevin û rêz li sembolên neteweyî bête girtin.

3. Di têkoşîna dijî dewletên dagîrker û kolonyalîst da, li ser hisaba rêxistinên dî yên neteweyî divêt nekevin nav hisabên teng û rêxistinî.

4. Digel rêxistinên neteweyî her bi çi rengî be di nav dîyalogê da bin.

5. Piştevanîya hêzên neteweyî di dereceya herî bilind da bête ragirtin.

6. Kerkûk û hemû tixûbên Kurdistanê beramberî dagîrkeran her bi çi metodî be bi hev ra bêne parastin.

7. Şerê di navbeyna hêzên neteweyî da, wekî sûcê neteweyî bête qebûl kirin.

8. Her kîjan hêza neteweyî li ser têkçûna hêzeke dî ya neteweyî bikeve nav pratîkeke şaş, divêt wekî alarmeke sor bête qebûl kirin û beramberî vê ji rêya neteweyî derketinê, hemû dînamîkên neteweyî di nav alarmê da bin û refleksa parastina berjewendîyên neteweyî bi rengekî aktîv û lêveker nîşan bidin û rê li ber şkestina navxweyî ya neteweyî bigirin.

9. Ji bo ku yêkitîya neteweyî ya demokratîk mayînde bibe, divêt organîzasyonên wekî meclis, platform, kongre û yên dî bêne pêkînan.

## BEŞA SÊYEM: Endametiya Kongreyê û Sond

**Bend 8: Endametî**
(Guhertin, 23.08.2000 Civîna Duyem)

a. Herkesê 18 salî yê/ya ji reng, bawerî, cinsiyet û neteweyên cuda yên Kurdistanê, dikare bibe endamê KNKyê.

b. Kes û rêxistinên faşîst û kevneperest, nikarin bibin endamên KNK.

c. Kesên ku bi cezayên kriminalî hatine cezakirin nikarin bibin endamên KNKyê. Yên ku sûce kriminaliyê li ser sabit bûyî ji endametiyê tên derxistin.

d. Kesên du jin heyî nikarin bibin endamê KNKyê, yên du jin heyî ji endametîyê têne derêxistin.

e. Kes û rêxestinên ku bi kiryarên xwe ve zerarê digihînin yekîtiya neteweyî nikarin bibin endamên KNKyê, endamên wisa jî têne derxistin.

f. Partî, rêxistin, sazî û kesayetiyên serbixwe yên niştimanperwer ku beşdarî civata damezrandina kongreyê bûne û peymana wê dipejirînin, dibin endam.

g. Parti û rêxistinên sîyasî yên ku endamên wan di KNKyê de nînin, dikarin têde bibin endamên çavdêr. Dikarin dîtinên xwe di civînan de bînin ziman lê mafê wan yê dengdayînê nîne.

h. Civata Giştî dikare endamên nû ji bo Kongreyê bipejirîne.

i. Partî, rêxistin û sazîyên endamên KNKyê, çawa ku endamên xwe ji bo endamatiya KNKyê destnişan dikin, wiha jî xwedi maf in ku endamên xwe biguherin

j. Kongre biryar dide ku her partiyek, rêxistinek û dezgehek, çend nûnerên wana hebin û bi çi şêweyî nûneriya wana tê kirin û hilbjartina endamên serbixwe çawa dibe.

k. Civata Giştî di paşerojê de peyreveke taybetî ji bo hilbijartina endamên xwe amade dike.

**Bend 9: Sond**

a. Hemû endamên Civata Giştî sond dixwin, dîwana demî ya Civata Giştî biryarê li ser awayê sondxwarinê dide.

b. Sond ev e:

*Ez bi rûmeta xwe sond dixwim ku ez dê herdem niştiman û berjewendiyên gelê Kurdistanê biparêzim û ji bo pêşvebirina xelkê Kurdistanê xebatê bikim; ez dê bi peymana Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê ve girêdayî bim.*

## BEŞA ÇAREMÎN: Dezgehên Kongreyê

**Bend 10: Dezgehên kongreyê**
(Guhertin, 13-14. 05.2006 Civîna şeşemîn)

1. Civata Giştî
2. Konseya Rêvebir
a. Komisyona Karê Derve.
b. Komîsyona Jinan
c. Komisyona Ziman, Perwerde, Çand û Hunerê
3. Komîteya Huqûqa Navxweyî

**Bend 11: Civata Giştî**
(Guhertin, 13-14. 05.2006 Civîna şeşemîn)



www.arsivakurdi.org

a. Civata Giştî bilindtirîn organa kongreyê ye, ji 135+15 (Ev 15 endame ji teref Konseya Rêvebir ve li goreyî hewcehîyê têne tesbît kirin) = 150 endaman pêk tê. Ji bo du salan tê hilbijartin û salê carekê bi awayê asayî kom dibe. Li ser pêşnîyara Konseya Rêvebir, Civata Giştî dikare hejmara endaman biguhere.

b. Li ser daxwaza Konseya Rêvebir yan jî ya 1/5 ji endamên Civata Giştî, kombûna awarte tê kirin.

c. Kombûnên Civata Giştî bi amadebûna zêdetir ji nîvê endaman pêk tê û dikare biryaran bide.

d. Civata Giştî, di her civîna xwe ya giştî de serokekî /ê, du cihgirên wî/ê û du nivîseran ji bo dîwanê hildibijêre.

e. Civata Giştî, li ser pêşniyaza 1/5 ji endaman yan ya Konseya Rêvebir, bi piraniya dengên endamên xwe dikare berî dawiya dema xwe, biryara nûvekirina xwe bide.

f. Civata Giştî li ser pêşniyaza 1/5 ji endamên xwe yan jî li ser daxwaza Konseya Rêvebir, tenê ji bo carekê, bi mercên ku ji salekê dirêjtir ne be, dikare biryara dirêjkirina dema xwe bide.

**Bend 12: Erk û Desthilatiyên Civata Giştî**

(Guhertin, 13-14 .05.2006 Civîna şeşemîn)

a. Hilbijartina Serokê/a Kongreyê, endamên Konseya Rêvebir û endamên Komîteya Huqûqa Navxweyî.

b. Pejirandin an redkirina projeyên ku ji aliyê Konseya Rêvebir an ji aliyê endamên Civata Giştî ve tên pêşkêşkirin.

c. Guhartina peymana Kongreyê, bi dengên ji nîvî yek zêdetirên endamên Civata Giştî ve tê kirin.

**Bend 13: Serok**

(Guhertin, 13-14 .05.2006 Civîna şeşemîn)

a. Serokê/a kongreyê, kongreyê temsîl dike û li hember Civata Giştî berpirsiyar e.

b. Serokê/a Kongreyê, ji aliyê Civata Giştî ve, bi dengên ji nîvê endaman pirtir, tê hilbijartin. Di du gerên pêşî de eger tu namzet nîvê pirtir dengan nestînin, di gera sêyem de, du namzetên di gera duyem de pirtir deng standin, beşdar dibin û yê/ya piraniya dengan distîne tê hilbijartin.

c. Serokê/a Kongreyê ji bo du salan tê hilbijartin.

**Bend 14: Konseya Rêvebir**

(Guhertin, 13-14 .05.2002 Civîna şeşemîn)

a. Konseya Rêvebir, li hember Civata Giştî berpirsyar e.

b. Konseya Rêvebir, organa rêvebiriyê ye û biryarên Civata Giştî û hemû kar û barên kongreyê rêve dibe.

c. Konseya Revebir, ji 15 kesan (Serokê/a Kongreyê û 14 endam) pêk tê.

d. Endamên Konseya Rêvebir ji aliyê Civata Giştî ve, ji bo du salan tên hilbijartin

e. Konseya Revebir, ji nav endamên xwe çar cihgirên serok, berdevkekî / ê û serokên komîsyonan hildibêjêre.

f. Konseya Revebir kar û xebatên ragihandinê, aborî û darayî tenzîm dike û dimeşîne.

g. Konseya Rêvebir her sê mehan carekî bi awayê asayî kom dibe.

h. Di rewşa awarte de li ser daxwaza serok yan jî, ya 1/3 ji endaman kom dibe.

**Bend 15: Erk û Desthilatîyên Konseya Rêvebir**

(Guhertin, 21.12.2002 Civîna Çarem)

a. Bicihanîna biryarên Civata Giştî.

b. Pêkanîna çalakiyan ji bo bicihanîna armancên Kongreyê

c. Çareserkirina kêşe û nakokiyan di navbera partî û grubên siyasî yên Kurdistanê de.

d. Amadekirina butçeya kongreyê û pêşkêşkirina wê, ji Civata Giştî re.

e. Amadekirina proje û pêşniyazên pêwîst ji Civata Giştî re.

f. Konseya Revebir, goreyî pêwîstiyan dikare komîte û buroyan ava bike.

**Bend 16: Vekişandina Dengê Bawerîyê û Hilbijartina Serokê/a Nû**

a. Konseya Rêvebir li hember Civata Giştî berpirsyar e.

b. Civata Giştî dikare bi piraniya dengên endamên xwe baweriya xwe ji Serok û ji Konseya Rêvebir bikşîne.



www.arsivakurd.org

c. 1/5 ji endamên Civata Giştî dikarin daxwaza vekişandina baweriyê ji Serok û Konseya Rêvebir bikin.

d. Bi mirin yan dest ji karberdana serok, Civata Giştî bi awayekî awarte ji bo hilbijartina serokekî/a nû kom dibe.

**Bend 17: Komisyonên Kongreyê**
(Guhertin, 13-14 .05.2006 Civîna şeşemîn)

a. Hemû komisyonên ku di paragrafa duyem li benda dehan da hatine destnîşan kirin, herî kêm ji 7 endaman pêk tên .

b. Serokên komisyonan ji nav endamên Konseyê, endamên komîsyonan ji nav endamên Civata Giştî, ji aliyê Konseya Rêvebir ve, ji bo du salan tên hilbijartin.

c. Ev komisyon bi şêweyê asayî her çar mehan carek kom dibin. Serokên komisyonan jî, ji sêyan yek ji endaman, dikarin daxwaza kombûnên awarte bikin.

d. Endamên van komisyonan nikarin bibin endamên zêdetirê du komisyonan.

e. Serokên her yek ji van komisyonan plan û projeyên xwe ji bo pejirandinê ji Konsêya Rêvebir re dişînin.

**Bend 18: Erk û Desthilatiyên Komîsyonan**
(Guherin, 13-14 .05.2006 Civîna şeşemîn)

Her komisyonek ji van komîsyonên jêrîn di bin çavdêrîya Konseya Rêvebir de, ji bo pêkanîna armancên vê peymanê li hember Konseya Rêvebir berpirsiyar in.

1. Komisyona Karê Derve; di warê têkiliyên derve de erkên xwe, bi hevkarî û şêwirmendiya Konseya Rêvebir bi cîh tîne.

2. Komisyona Jinan; ji bo azadîya jin û parastina mafên wan dixebite.

3. Komisyona Ziman, Perwerde, Çand û Hunerê;

a. Piştgirîya plan û projeyên pêwîst, ji bo pêşxistin û geşkirina warên roşenbîrî, çandî û hunerî yên Kurdistanê dike.

b. Hewl dide ku huner, çand û perwerdeyê li derve û li hundurê welat geş bike û pêş bixe.

c. Herwisa ew hewl dide ku zaravayên Kurdî bên parastin, lê ji bo xurtkirin û sazkirina zimanekî Neteweyî û yekgirtî xebatê dike.

d. Li ser perwerdeya Zimanê Kurdî radiweste, bi hemû dezgehên di vî warî de dixebitin re, hevkarîyê dike û wan koordîne dike.

**Bend 20: Komîteya Şêwirmendîyê**
(Guhertin, 23.08.2000 Civata Duyem û 21.12.2002 Civîna Çarem)

a. Komîteya Şêwirmendîyê ji aliyê Konseya Revebir ve tê destnîşan kirin. Endamên wê herî kêm 13 kes in.

b. Komîteya şêwirmendîyê serokek û sekreterek ji bo du salan hildibijêre.

c. Ev komîte li ser kêşeyên Neteweyî û navneteweyî nêrîna xwe ji bo Konseya Rêvebir diyar dike.

d. Ev komîte bi daxwaza serokê/a xwe, serokê/a Kongreyê yan ji nîvî zêdetirê endamên xwe kom dibe.

e. Ev komîte ji bo rêkûpêkîya karên xwe peyrevek hundurîn amade dike.

**Bend 21: Komîteya Huqûqa Navxweyî**
(Guhertin; 13-14 .05.2006; Civata şeşemîn)

a. Komîteya Huqûqa Navxweyî, ji pênc (5) endamên esil û ji du cihgiran pêk tê û ji bo du salan ji aliyê Civata Giştî ve ji nav endamên Civata Giştî tên hilbijartin.

a. Endamên Komîteya Huqûqa Navxweyî di tu dezgehên din, yên Kongreyê de cih nagirin.

b. Endamên vê komîteyê, ji nav xwe serokekî/a û cîgirekî/ê ji bo 2 salan hildibijêrin.

c. Biryarên vê komîteyê, bi piraniya dengên endamên xwe tên girtin.

d. Konsêya Rêvebir, dikare ji bo bicihanîna karekî ne di rê da, daxwaza civîna vê komîteyê bike.

e. Biryarên Komîteya Huqûqa Navxweyî ev in:

1. Redkirina daxwaza Konseya Rêvebir.
2. Balkişandin, yan hişyarkirina gilîkirî
3. Rawestandina endametiya gilîkirî, ji bo demeke diyarkirî.
4. Derxistina gilîkirî, ji Kongreyê bi awayekî herdemî.



www.arsivakurd.org

f. Gilîker û gilîkirî, dikarin biryarên Komîteya Huqûqa Navxweyî ji bo biryara dawî bibin Civata Giştî.

## BEŞA PÊNCEMÎN:
## Çareserîya kêşe û nakokiyên di nav hêzên Kurdistanê de

**Bend 22: Awayê Çareserîya Kêşe û Nakokîyan**

1. Kongre hewl dide ku ji bo her cureyên alozî û nakokiyên siyasî yên di nav hêzên Kurdistanî de, bi rêya danûstandinan çareyan bibîne û aştiya Neteweyî bi cih bike .

2. Ger nakokiyek bibe sebebê bihevçûn û serê çekdarî, kongre hewl dide ku bi awayê jêrîn van nakokiyan ji holê rake.

a. Daxwaza rawestandina şer û bi nekaranîna çekan li dijî hev.

b. Konseya Rêvebir, aliyê ku bi daxwaza rawestana şer qayil nabe, agahdar dike ku helwesta wî ji bo berjewendiyên Neteweyî zerar e.

c. Eger ew alî li ser helwesta xwe ma û guh neda daxwaza Konseya Rêvebir, kongre helwestên pêwîst li hember wî digre û ji bo zelaliyê piştî lêkolinan raporek ji aliyê komisyoneke bê alî ve ku serok û endamên wê ji teref Konseya Rêvebir ve tên binavkirin, eşkere dike.

## BEŞA ŞEŞEM:
## Çend bendên giştî:

**Bend 23: Cih û demê avakirinê**

Civata Giştî di 24-26 Gulan 1999 an de, li Holanda li bajarê Amsterdamê kombûna xwe ya damezrandinê pêkanî, piştî gengêşî û danûstandinan ev peymana Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê pejirand.

**Bend 24: Cihê Kongreyê**

a. Kongre û dezgehên wê, heta vegera Kurdistanê, bi awayekî demî li paytextê Belçîk Brukselê cih digirin.

b. Konseya Rêvebir dikare cihê dezgehên xwe biguhere.

**Civata Giştî ya**
**Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê**
**26 Gulan 1999**

*(Pejirandin 26.05.1999 Civîna Damezrandinê, guhertin, 23.08.2000 Civîna Duyem, 17.12.2001 Civîna Sêyem, 21.12.2002 Civîna Çarem, 14.05.2006 Civîna Şeşem, 13-14. 12. 2008 Civîna nehem)*






www.arsivakurdi.org

# Peyreva Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê

**BEŞA YEKEM**
**Danasîn û prensîbên giştî**

**Xal 1- Dem; vekirin û rûniştin**
Demê Civata Giştî du sal in û hilbijartina giştî pêktêt. Civîna giştî, ji civîna ku di rojeke diyar de çêdibe re tê gotin. Rûniştin, ji her beşê civîna rojane re tê gotin.

**Xal 2- Sond**
Hemû endamên Civata Giştî ya Kongreyê, sond dixwin, dîwana demî ya Civata Giştî biryarê li ser awayê sondxwarinê dide. Endam, li goreyî rêza paşnavên xwe sond dixwin. Endamên ku di civîna yekem de amade nebûne, di yekem civîna beşdar bûn de, sond dixwin.

**Sond ev e:**
***Ez bi rûmeta xwe sond dixwim ku ez dê her dem niştîman û berjewendîyên gelê Kurdistanê biparêzim û ji bo pêşvebirina xelkê Kurdistanê xebatê bikim; ez dê bi peymana Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê ve girêdayî bim.***

**Xal 3- Civînên Asayî**
Kongre, civînên xwe yên asayî, salê carekê pêktîne.

**Xal 4- Civînên Awarte**
Di navbera du civînên asayî de, li ser daxwaza Konseya Rêvebir yan jî 1/5 ji endamên Civata Giştî, kombûna awerte tê kirin.

**BEŞA DÛYEM**
**Dîwan û Komisyon**

**Xal 5- Serokatiya Dîwanê ya Demî**
Ji destpêka rûniştina yekem ya xebata kongreyê, heta hilbijartina Serokê/a Dîwanê, endamê/a herî bi temen, serokatîya dîwanêdike. Yê/a ku bi temenê xwe di rêza dûyem de ye jî, dibe alîkarê serok. Du endamên herî ciwan jî, dibin endamên dîwanê.

**Xal 6- Dîwana Civata Giştî**
Civata Giştî, di her civîna xwe ya giştî de serokekî/ê, du cihgirên wî/wê û du nivîseran ji bo dîwanê hildibijêre.

**Xal 7- Berpirsiyariyên Dîwanê**
Dîwan, ji birêvebirina xebat û rêkûpêkbûna civînê berpirsiyar e.
Dîwan, bi bangkirina serok dicive û bi piraniya dengên beşdaran biryaran digire.

**Xal 8- Berpirsyarîyên Endamên Dîwanê**
a. Notan digirin û kontrola wan dikin.
b. Ji civîna giştî re belgeyan dixwînin.
c. Di civîna giştî de, navên endaman dixwînin.
d. Dengan dihejmêrin.
e. Hilbijartinan rêk û pêk dikin.
f. Rêza axiftinê qeyd dikin.
g. Li ser xebatan, endaman agahdar dikin.

**Xal 9- Raporên Komisyonan**
Komisyon, derbareyê pêşnûma û pêşniyazan de, biryar û daxwazên ku hatine kirin, wek raporekê amade dikin. Komisyon, di raporan de, dîtinên xwe û guhortinan, bi sedemên wan ve dinivîse.

**Xal 10- Di Civîna Giştî de Nûnertîya Komisyonan**
Demê ku ji komisyonekê, ji bo gotûbêjê, karek bête Civîna Giştî, serokê komisyonê, yan jî kesên ku ew tayin dike, bi çend endamên komisyonê ve, di rêza komisyonan de rûdinîn û di demê gotûbêjan de nûnertîya komisyonê dikin.

**BEŞA SÊYEM**
**Xebatên Civata Giştî**

**Xal 11- Rojev**
a. Babetên ku serokatî pêşkêşî civîna giştî dike.



www.arsivakurdi.org

b. Babetên ku bi şêweyekî taybetî di rojevê de cih digirin.

c. Hilbijartin.

d. Babetên ku têne dengdanê.

e. Danûstandinên giştî û lêpirsînên (tehqîqatên) ku Civata Giştî li ser endamên Konseya Rêvebir dike.

f. Pirsên bi devkî.

g. Pêşniyarên ji bo biryar, daxwaznameyan û karên dî yên ku ji komisyonan tên.

Ew kar û babetên ku li ser wan gotûbêj û danûstandin çêdibin, li gor demê ku ew ketine destê serokatîyê, têne rêzkirin. Heger pêwîstî bê dîtin, li ser pêşniyaza Konseya Rêvebir yan jî bi xwestina nivîskî ya deh endaman, civîna giştî dikare rêza rojevê biguhere.

**Xal 12- Vekirin û Girtina Civîna Giştî**

Serokê/a Dîwanê rûniştinan vedike û digire. Heta dawîya rûniştinan, du endamên dîwanê, bi serok re di dîwanê de cîh digirin. Demê serok ne amade be, cîgirekî wî/ê, serokatiyê dike.

**Xal 13- Axiftinên ji Derveyî Rojevê**

Di destpêka Civîna Giştî de, heger serok pêwîst bibîne, li derveyî rojevê, dikare mafê axiftinê bide sê kesan. Divêt axiftin her yekî ji pênc deqîqeyan zêdetir nebe.

Axiftin bi rêzê ye, nav li nik serokatiyê tên nivîsandin. Derbarê mijarê de serok agahdar dikin. Axiftin, li kursiyê û li hember Dîwanê û Civîna Giştî tê kirin.

Endamên Konseya Rêvebir, herdem dikarin ji derveyî rojevê biaxivin.

**Xal 14- Usûl û Rêza Axiftinan**

Babetên li ser usûlê dikevin rêza pêşîn. Di danûstandinan de axiftin li ser, li dij û li gel tên kirin.

Mafê axiftinê, li gorî rêza nivîsandinê dibe. Lê belê, endamên Konseya Rêvebir û nûnerên komisyonan, dikarin mafê taybetî bi kar bînin.

**Xal 15- Beşdarnebûna Serok û Endamên Dîwanê di Danûstandin û Nîqaşan de**

Serok, yan jî cîgirê wî û nivîserên ku li dîwanê rûniştîne, di demê hevdîtinan, nîqaşan û dengdanê de, qet nikarin dîtinên xwe bêjin û beşdarî gotûbêjan bibin. Heger pirs girêdayî şexs û berpirsiyarîya wan be, mafê wan heye ku biaxivin.

**Xal 16- Di Danûstandî de Prensîbên Giştî**

Di civînên giştî de gotin birîn, bi şexsiyetan lîstin, heqaret kirin û tevlihev kirina rewşê qedexe ye.

Bi tenê, serok dikare ew kesê ku li kursiyê diaxive wê/wî dawetî prensîbên peyrevê bike ku axiftina xwe li goreyî mijarê bike.

Ew kesên ku du caran bala wê/wî bê kişandin, li ser daxwaza serok, ji aliyê Civîna Giştî ve mafê wê/wî yê axiftinê dikare jê bê standin.

**BEŞA ÇAREMÎN**
**Derxistina Biryaran**

**Xal 17- Pêşnûmayên Biryaran, Pêşniyaz û Pêşkêşkirina wan ji bo Komisyonan**

Pêşnûma û biryarên ku ji Konseya Rêvebir tên, ew, ji aliyê piraniya endamên Konseya Rêvebir ve tên îmza kirin û bi sebebên wan, pêşkêşî Serokatiya Dîwanê tên kirin.

Pêşniyazên ji bo biryaran, ku ji aliyê endaman ve tên dayin, bi îmzayek yan jî bi çend îmzayan dikarin bên amade kirin û bi sebebên wan ve pêşkêşî serokatiyê dibin.

Serokatî, wan pêşniyaz û daxwazan qeyd dike û piştre pêşkêşî komisyona têkildar dike.

Heger komisyon kêmasiyan bibîne, ji bo serûberiya wê, bi paş ve ji xwediyê wan re bi rê dike.

Xwediyên wan jî dikarin daxwaz û pêşniyazên xwe paşve bigirin.

**Xal 18- Danûstandinên Giştî**

Berî danûstandinên li ser pêşniyazên biryar û daxwazan, pêşî li ser gelemperiya wan axiftin tên kirin. Axiftinên konseyê û komisyonan bi 20 deqîqeyî tên tixûb kirin. Ev, ji aliyê Civîna Giştî ve dikare bê guhertin. Mafê axiftinên li ser xalan, nîvê wê ye. Mafê endaman heye ku, bi qasî nîvê endamên Konseya Rêvebir biaxivin.

**Xal 19- Danûstandin û Dengdan**

Konseya Rêvebir û nûnerên komisyonan û endamên Civatê, dikarin di derheqê guhertina pêşniyazên biryar û daxwazan de, daxwaznameyan bidin.



www.arsivakurdi.org

Ji bo guhertina, pirs ji komisyona ku pê ve têkildar re, tê kirin.

Heger xwediyê daxwaznameyê bixwaze, dikare di vê babetê de mafê axiftinê bistîne, lê divêt axiftin ji pênc deqîqeyi zêdetir nebe.

Li ser xalan yek bi yek danûstandin tên kirin û dengdan çêdibe.

Demê danûstandin li ser xalan xilas dibin, proje û daxwaz, bi gelemperî dikevin dengdanê.

## BEŞA PÊNCEMÎN
## Rêyên Kontrolê

**Xal 20-Pirs**

Pirs, daxwaznameyeke kurt e, tê de dîtineke şexsî tune ye, ji bo agahdarî girtinê, derbarê babetekî de, bi devkî yan jî bi nivîskî, ji endamên Konseya Rêvebir tê kirin.

Pirs, endamek tenê amade û pêşkêş dike.

Pirs, pêşkêşî serokatiyê dikin û serokatî jî, wê daxwaza ku hatiye, ji bo bersîvdayinê, ji endamên konseyên tekildar re dişîne.

Ew endamê konseyê, ku pirs jê hatiye kirin, bi rêya serokatiyê bersîvê dide. Bersîva pirsên bi devkî, di Civîna Giştî de tê dayîn.

**Xal 21- Hevdîtinên Giştî**

Di hevdîtinên giştî de, mijarên diyar û xebatên civatî û giştî, tên ziman û gotûbêj kirin. Ji bo vekirina hevdîtinên giştî, Konseya Rêvebir, yan jî bi kêmasî li ser daxwaznameya 20 endaman, bi pejirandina Civîna Giştî, mijar dikevê rojevê.

**Xal 22- Lêpirsîna Civata Giştî**

Ji bo dayîna daxwaznameya lêpirsîna Civata Giştî, ku derbarê endamên Konseya Rêvebir de, ji 1/5 dengên endaman pêwîst e. Divêt Civata Giştî di demekî kurt de, li ser wê danûstandinê çêbike û di çarçoveyeke giştî de biryarê bide.

**Xal 23- Daxwaznameya Vekişandina Baweriyê**

Daxwaznameya vekişandina baweriyê ew e ku, derbarê endamên Konseya Rêvebir de, bi kêmasî 1/5 endaman, daxwaznameyê îmza bikin û bidin dîwanê.

Ji bo pejirandina daxwaznameyê, ji nîvî zêdetir dengên endaman pêwîst in.

## BEŞA ŞEŞEM
## Xalên Curbecur

**Xal 24- Şêweyên dengdanê**

a. Dengdana bi îşaretan
b. Dengdana vekirî
c. Dengdana veşartî

**Xal 25- Guhortina Peyrevê**

Di derbarê pêşniyazên ji bo guhortina peyrevê tên dayin de, xalên derbarê biryaran de, tên bikaranîn.

**Xal 26- Bikaranîna Xalan**

a. Babetên ku ji bo wana xalek taybet nîne, xalên Peymana Kongreyê, yên di derbarê wan de tên bikaranîn.

b. Heger di navbera destûr û Peymana Kongreyê de nakokiyek hebe, Peymana Kongreyê bingeh tê girtin.

**Xal 27- Komiteya Huqûqa Navxweyî**

a. Komiteya Huqûqa Navxweyî ji endamên Civata Giştî, ji bo du salan tên hilbijartin û hêjmara wan pênc esil û du cihgir in.

b. Endamên komîteyê, di navbera xwe de serokekî/ê hildibijêrin. Biryar, bi dengê piranî tên standin. Endamên cihgir, beşdarî biryaran nabin.

c. Endamên vê komîteyê, di tu dezgehên din yên Kongreyê de cih nagirin.

d. Endamên ku li dijî berjewendiyên neteweyî, yan jî li dijî Peymana Kongreyê derdikevin û tevdigerin, ji hêla Konseya Rêvebir ve, sewkî Komiteya Huqûqa Navxweyî dibin.

e. Biryarên ku Komiteya Huqûqa Navxweyî dikare bigire:

I) Hişyar kirin.
II) D ûrkirina demî.
III) Xistina ji endametiyê.

f. Gilîker û gilîkirî dikarin biryarên Komiteya Huqûqa Navxweyî, ji bo biryara dawî, bibin Konseya Rêvebir.

**Xal 28-Rêvebirî**

Ev rêbaz, ji hêla Konseya Rêvebir û Dîwanê e tê rêvebirin.

www.arsivakurdi.org

# Mesajên ji bo 9. Civata Giştî ya KNK ê

*Mesaja Serokatiya Konseya Rêveber ya KCK ê*

## *Ji Bo Serokatiya Dîwana 9. Civata Giştî ya KNK ê*

**Serok û endamên birêz;**

Em bi navê Koma Civakên Kurdistan, sêrîde hemî endam û beşdarvanan bi dil germî silav dikin û ji civata we re serketinê dixwazin.

**Dost û Hevalên Hêja;**

Di demeke ku boyerên giring li Kurdistan û Cihanê diqewimin, hûn Civata Giştiya KNK ê ya 9. pêktênin. Li Bakur, li Rojhilat û li Başûrêrojava êrîşên tunekirinê li ser gel û tevgera azadiyê berdewamin. Her çend pêşketinên giring hebin jî, lê pirsgirêk bi temamî nehatine çareserkirin û tehlîke berdewamin. Îtîfaqa Turkiye, Îran û Sûrî ya hember Gelê Kurd didome û niha gav bi gav rayedarên Êraqê jî, dikevin nava vê îtîfaqê.

Li Başûrêrojava, guhertinek mezin di rojevê de nîne. Tekoşîna azadiyê berdewame. Li Rojhilat, li hember êrîşên Dewleta Îranê, tevgera azadiyê bi rêxistinî, bi girseyî, bi siyasî û bi eskerî roj bi roj xurttir dibe û dikeve rojeva navnetewî.

Tevger û tekoşîna mezin li Bakûre, şerê azadiyê her diçe gurtir dibe. Li vî parçê welatê me de li gel şerê dijwar, heman demê de lêgerînên çareseriyê jî zêdetir dibin. Dewleta Tirk, niha dixwaze weke salên 90 an, carek din Kurdan bîne hember hev. Ji bo wê, ev demeke li Êraqê û li Başûr, hinek peywendî û hevdîtinan pêktîne. Eger di van hewldanên xwe de sernekevi, îmkanên ku riya diyalogê vebin zêdetir dibin.

Li Başûr, pirsgirêka Kerkûk û deverên din yên Kurdî û ne li ser Kurdistanê berdewame. Gorî peymana nû, Emerîka pêwîste di nava sê salan de, hêzên xwe ji Êraqê derxe. Di herêmê de ne zelaliyek heye û rewşeka xeter di rojevê de ye. Ev rewş jî dide nîşan ku çareseriya li parçeyekî Kurdistanê, eger bi çareseriya parçeyek din neyê destek kirin, deskeftiyên wî parçeyî jî, herdem di xeteriyê de ne.

Îro tehlîka mezin ya li hember Gelê Kurd, êrîş û lêgerînên xirab yên Dewleta Tirk in. Eger em bikarin van êrîşan vale derxin, teybetî jî, nehêlin ew lêgerînên wan serbikevin, wê demê em dikarin riya çareseriyê vekin. Her çend dijminê mezin dewleta Tirk be jî, hêza mezin û tekoşîna me ya mezin jî, li Bakûrin. Îmkanên çareseriyê li vî parçeyî zêdebûne û çareseriya Bakûr, herweha riya çareseriya tevayî Kurdistanê vedike.

Îro wezîfa hêzên Kurdî ya sereke ewe ku, li Başûrêrojava û li Rojhilat tevgerê xurtbike, li Başûr deskeftiyan biparêze, li Bakûr di hemî warîde tekoşînê xurtbike, teybetî lêgerînên Dewleta Tirk yên li başûr vale derxe û li Bakûr riya çaseriyê veke.

**Hevalên Hêja;**

Em dizanin ji bo yekîtiya netewî û pêkanîna stratejiyek neteweyî, di rojeva we de Belgeya Stratejîk jî heye. Em giringî didin van helwestan. Ew belgeya stratejîk ya we amadekirî û ji me re jî şandî, em di cihde dibînîn û di huzûra we de îmze dikin. Em dibêjin di xeta netewî de emê gorî vê belgê tevbigerin û emê vê îmza xwe ve girêdayî bin. Em hêvî dikin ku her hêzek Kurdistanî vê belgeyê îmze bike û pêve girêdayî bimîne.

**Hevalên Hêja;**

Hûn niha Civata Giştî ya nehemîn pêktînin û ber bi salvegera dehemîn ya Kongra Netewiya Kurdistan ve diçin. Dezgehek weke KNK, li gel hemî zor û zehmetan ku deh sale

www.arsivakurdi.org

xizmeta neteweyî dike û xwe nû dike, kareke giring û pîroze.

Di vê merhela nû de, gorî baweriya me, li gel karên din jî, du karên esasî li pêşiya KNK ê ne. Yek hewladana pêkanîna yekîtiya netewî û stratejiyek netewî. Di vî warî de ev deh salin gavên mezin hatine avêhtin û Kurd ji hemî deman zêdetir nîzingê hev bûne. Lê ev kar û xebat hê jî negihiştiye encamê û ji bo her rêxistinekî erkek serekeye.

Didû jî, li derve temsîla Gelê Kurd e. Yanî pêkanîna lobî û dîplomasiyê ye. Hûn dizanin pirsgirêka Kurd pirsgirêgek navdewletiye, ne tenê rojhilata navîn hemî Cihanê eleqeder dike. Hêzên cihanî yên mezin jî, bi awayê pozîtîv û negatîv di vê meselê re eleqeder dibin û bandora wan jî, herdem li ser meselame zêdebûye. Kurd zêdetirê 40 milyonanin, lê heta niha li ti dezgehên navnetewî de nayên temsîlkirin. Ji bo vê jî, pêwîstî bi dîplomasiyek xurt û hevbeş heye. Em hêvî dikin ku KNK di vîwarî de jî bibe bersiv.

**Serok û endamên birêz;**

Ji amadekariyên avakirinê û heta niha em weke rêxistin, piştgiriya KNK ê dikin. Di vî warî de çi hatiye ser milê me, heta niha me kiriye. Teybetî fikr û hewdanên Reber Apo, ji bo avakirina dezgehek vî rengî, rê li ber me vekiriye. Reber Apo piştî hate girtin jî, ev helwesta xwe berdewam kir û ji zîndanê jî mesaja destekdana avakirina KNK ê, ji rêxistinê re rêkir. Di avakirina KNK ê de keda Reber Apo, bo bingehek esasî. Em jî weke reweberiya xwe bawer dikin kû dezgehên neteweyî pêwîstin û hewldana yekîtiya neweyî karek esasiye. Ji bo vê emê ji îro pêve jî, KNK ê destek bikin û ji bo serketina wê emê zemînê xweş bikin.

Bi van hîsan em carek din, we hemiyan silav dikin û ji 9. Civata Giştî ya KNK ê re serketinê dixwazin.

*Mesaja Seroka Yekîtiya Parlamenterên Kurdistan ê*

***Birez… komiteya amadekarya kombûna giştî ya knkyê***

Mixabn em neşiyan viza wergirin bo ye dawai leburdin dikeyn serkeftibin ji kara kombuna we.

Supas

**Nimat Abdulla**
**Saroka Yakiti Parlamantarin Kurdistan**

www.arsivakurdi.org

*Mesaja Dr. Kamuran Berwarî*

## *Ji bo Kongreya Netewiya ya Kurdistanê-KNK-*

**Rêz û silav**

Pirozbahiya civina we dikim hêvîdarin di karê xwe de serkefti bin me pir pê xweş bu di vê kombunê de amade bibin lê derfet nebu, ev hindek bocûnêt me ne li ser tiştê pêdivî ji bo stiratîciyeta yekîtiya netewiya kurdistanê bihê te kirin.

1. Berî her tiştî pêwiste çend zana rewşenbîr siyasetmedar hizir mend felsefenasin kurd li hev bi civin û bernameyeke stratîcî ji bo yekîtiya netewi darêjin ,mifa(menfiet) ji her tiştî wergirin bi taiybetî felsefa serok ocelan,bi vê yekê, dê kurd bibin xudan bername û felsefa taiybeta jiyana xwe

2. Pêwiste ew bername di konfranseka netewi de bihête baskirin nexşe ji bo bihête kêşan û bikevêde di warê bi cihînanê de.

3. Li dîv cun ji bo wî bernamê hebêt, û ew konfirans wî bername bidê te dest KNK û licneka taybet ji bo vê mebestê bihête pêkînan.

4. Fere(pêwîste)ji bo yekîtiya netewî û parestina stratîciya yekiytiya netewî ya kurdistanê ,komosyona kurdistanê bihêta danan kesayetiyê siyasî ekadimî welat parêz tê de cih bigrin.

5. Fere sinûrên kurdistanê li gor belgenameyên dirokî cûgrafî siyasî bihêne diyar kirin,ji layê licneka pispor ve.

6. Diyar kirina hêlên sor di bizava rizgarîxwaza kurdî yekitiya netewaî de ji wan xalan :

- Ci kesû hêzû layenekî li jêr her biyanuyeka(hêcet)maf nîne axa kurdistanê bifroşêt yan dest ji bajêrekî yan herêmekî berdêt li jêr her fişareka hebêt cimkû eva xiyaneta mezine .
- Heram kirina bira kujiyê û xizmetkirina dijminî bi her awayekî hebêt
- Nabêt dest li sermaye û dahatên netewey bidin ji bo bercewendiya kesî û hizbî.

7. Parastina binamayên yekiytiya netewiya kurdî pêk diînin û zindî kirina wa binamayan bi awayekî di gel jiyana taze biguncin.

8. Divêt kurd bi çi rengekî destberdayê (uzleşme) li ser pirsên xwe yên netewez niştimanî çare nivêsî stratêcî nekin.

9. Fere kurd pirojeyekî nû ji bo rojhelêtî danin pêş çav li ser vî binemayê jêrîn:

- Em weku kurdistanî pêşniyar dikin li serta serî rojhelata navîn sistemekî konfidralizmî ji Turkiya Iran Iraq kurdistan welatê şamê girava erbî dirist bibê.
- Eger pirojê jimara (a) ji xala (9) bi cihi nehat daxwaz dikin ji dewletên kurdistan dagir kirine sistemên fîdralî di welatê xwe de bi kar bînin û bi diristî mafên kurda û netewên din bidinê.
- Eger ev du xale (a,b)bi cih nehatin her ji nuke kurd dê ji bo dewlwteka kurdistanî ya fidralî ya serbıxwe kar bikin,çimku hebûna vê dewletê di jî çi kes û hêzû layenekî nîne belku hokarê saqamgîriya rojhelata navîn û cîhanê ye.

10. Divêt ji bo bicih înana van xala xelkê kurdistanê li ser piya bêt xwedî îradebêt serweriya xwe bi parêzêt.

11. Fere kurd damu dezgehên netewayê ava bikin xwe ji bo qonaxa bihêt amade bikin mafên xwe werbigrin

12. Divêt partiyên kurdistanî û deshelatdarên kurd xwe ji bo raya giştiya kurdistanê biçemînin û rêz li îrada miletî bigrin û bizivrineve bo raya giştiya cemawerê kurdistanê



www.arsivakurdi.org

# Daxuyaniyên KNK ê

*Konseya Rêvebir ya KNKê 15.12.2008*

**Civata Giştî ya 9. ya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê [KNK] xilas bû.**

Federal wekî çavdêr di KNKyê da cihê xwe girtin KNKyê civata xwe ya giştî ya 9. di 13-14ê Kanûna 2008ê da li Brukselê pêkîna. Ji 135 endamên nû yên KNKyê 90 Kurd ji Kurdistanê û meydanên dîasporayê yên wekî Amerîka, Rûsya, Kazakistan, Ermenistan, Awustralya û Misirê, beşdar bûn. Yên nehatî jî ji ber sebebên teknîkî nikarîn beşdarî civata giştî bin, lê pîrozbahî şandin. Herwisa ji kêmanîyên Kurdistanê endamên Asûrî-Suryanî-Kildanî jî hazir bûn. Ji Kurdistana Federal û welatên cuda yên Ewrûpayê mêhvan jî amade bûn û axivtin kirin. Dîsa ji gelek partî, rêxistinên kulturî û kesayetîyên polîtîk û ronakbîr mesaj hatin, civata giştî pîroz kirin. Ji bilî endamên berê yên rêxistinan, du rêxistinên nû ji Kurdistana Federal bûne endam û du rêxistin jî ji Kurdistana.

**Endamên rêxistin ev in:** *PJAK, PÇDK, PYD, YJA, Hîzbî Sosyalîstî Kurdistan, Bizûtneweyî Demokrasîxwazanî Kurdistan, Hîzbî Zehmetkêşî Kurdistan [Çavdêr],Hîzbî Şûîyî Kurdistan [Çavdêr],Yêkitîya Neteweyî ya Demokratîk ya,Kurdistanê [YNDK] [Çavdêr],Yekîtiya Mamosteyên Kurd (YMK), CIK, Instîtuya Kurdî ya Brukselê, Instîtuta Kurdî li Elmanya, Enstîtuya Kurdî ya Stockholmê, Kon-Kurd,Akademîya Hunerî ya Kurdistanê, Federasyona Komeleyên Êzidîyan, Federasyona Elewîyên Kurdistanê,*

Herwisa gelek kesayetîyên serbixwe yên polîtîk û nivîskar, rojnamevan û ronakbîrên Kurd û Kurdistanî jî endamên KNKyê ne.

Civata giştî bi axivtin û riberizên li ser rojevê û belgeyên hatine pêşkêş kirin, di sewîyeya bilind da borî. "Belgeya Stratejîya Yêkitîya Neteweyî" bi yêkdengî hate erêkirin, Peyman û Peyreweke nûvekirî hate qebûl kirin. Li ser xurtkirin û aktîvkirina KNKyê dîtin û pêşniyar hatin kirin û biryarên giring hatin standin. Piştî xilasbûna civata giştî Konseya Rêvebir ya nû hatîye hilbijartin kombûna xwe ya yêkemîn kir û hem komisyon hatin ava kirin, hem jî planê xebatê hate çêkirin.

**Konseya Rêvebir ya nû ji van kesan pêkhat:** *Tahir Kemalîzade, serokê KNKyê, Adem Uzun, Remzî Kartal, Corc Aryo, Nîlûfer Koç, Rojan Hazim, Şemsettin Aktaş, Nizamettin Toguç, Felemez Başboga, Seyf Bedir Xan, Hêwî Berwarî, Miryem Muezzinî, Gelavêj Qadirî, Nezîf Mayî, Medenî Ferho*

**Ligoreyî peymana nû sê komisyon û sê komîte hatin ava kirin:** *Komisyona Karê Derve, Komisyona Ziman, Perwerde, Kultur û Hunerê, Komisyona Jinan, Komîteya Karê Neteweyî, Komîteya Huqûqa Navxweyî, Komîteya Weşan û Çapemenîyê,*

Konseya Rêvebir, li ber pêşniyar û biryarên civata giştî ya 9. analîza rewşa Kurdistanê, Rojhilata Navîn û cîhanê kir û daxwaza „Yêkitîya Neteweyî“ ji Kurd û Kurdistanîyan kir:Bizava neteweyî ya Kurdistanê di nav şertên gelek dijwar da pêşdikeve. Avabûna Kurdistana Federal ya di nav Iraqa Federal da, ji bo armancên xelkê Kurd û doza neteweyî ya Kurdistanê destkevteke mezin û giring pêkînaye, belêm herwisa leyiz, entrîka û desîseyên dewletên dagîrker jî zêdetir kirine. Vê rewşa nû dewletên dagîrker xistine nav hewildanên nû ku şiddeta xwe li ser xelkê Kurd û bizava neteweyî zêdetir bikin. Di bin oordînasyona dewleta Tirk da, Îran û Sûrîye bi hev ra êriş û planên xwe veşartî didomînin. Bi taybetî Tirkîye û Îran hem ji hewayî, hem jî ji reşahî êrişên xwe di dereceya herî bilind da berdewam dikin. Ev dewlet di nav xwe da digel operasyonên leşkerî û polîsî, herwisa mekanîzmayên dî yên dewletên xwe jî dijî xelkê Kurd bi kar tînin. Îranê çerxa îdamê daye dest pê kirin, têkoşerên Kurd îdam dike. Sûrîyeyê polîtîka xwe ya hilweşîyayî ya kevin, ya „Kemera Erebî“ û „qanûna mal û milk, madde 49ê“ dîsa ve aktuel kirîye û kirîn-firotina mal û milk ya Kurdan qedexe



www.arsivakurdi.org

kirîye. Tirkîyeyê bi metod û teknîkên nû zor daye polîtîkên xwe yên asîmîlasyon û jenosîda folklor û kultura Kurdî. Serokatî û piranîya hukûmeta merkezî ya Iraqa Federal jî bi şovenîzma Erebî ketîye nav reftareke dijminane beramberî bizava neteweyî ya xelkê Kurd. Di van komple êrişkarîyan da mixabin ku dewletên ku xwe nobedarên mafên mirov û demokrasîyê dibînin, dengê xwe nakin, hetta hem bi bêdengîya xwe, hem jî bi desteka istixbarî hevkarîya dewletên dagîrker dikin. Di vî warî da pratîka Dewletên Yêkbûyî yên Amerîkayê [Amerîka] û Yêkitîya Ewrûpayê [YE] mixabin ku dijî normên hebûna xwe ne jî. Tirkîye ji vê desteka Amerîka û YEyê hêzeke mezin werdigire û bi temamî lêdigere ku planekî têkbirina bizava neteweyî ya çekdarî realîze bike. Bi vê armancê Tirkîye bi israr fişarê dibe ser Kurdistana Federal jî ku beramberî bizava neteweyî ya bakur bikeve nav pratîkeke menfî. Di vî warî da dîplomasîyeke veşartî ya ku bêhna xirabî û neqencîyê jê têt, tête raçandin ku encamên wê dê gelek wêranker bin. Mafê xelkê Kurd heye ku detayên vê dîplomasîya bêyûm bizane ku bi tifaqa navxweyî ya li ser esasê stratejîya yêkitîya neteweyî van polîtîkên ne di xêra xelkê Kurd da betal derêxe. KNK pozisyona Amerîka û YEyê ya di vî warî da jî bi endîşe taqîb dike û gelek vekirî wan hişyar dike ku ji vê polîtîka xwe vegerin û destekê nedine dewleta Tirk, tam bereks piştevanîya xelkê Kurd bikin.

KNK di nav vê hercûmercê da dixwaze hemû Kurdan serwext û agahdar bike ku beramberî van planên dijî Kurd û Kurdistanê, hişyar bin, refleksa xwe ya parastina yêkitîya neteweyî her bi çi rengî be nîşan bidin û rê li ber dek û dolabên dagîrkeran bigirin. Ji ber bilindkirina pozisyona neteweyî, KNK dê „Belgeya Stratejîya Neteweyî ya Kurdistanê" ji bo hemû hêz û kesên neteweyî rêbike ku gotûbêjekê li ser avakirina zemînê yêkitîya neteweyî bide dest pê kirin. KNK giringîyeke mezin dide krîterên belgeya stratejîya neteweyî ku wezîfeyên neteweyî bi giringî destnîşan dike.

Li goreyî biryara civata giştî nameyek dê bo rêberê KCKyê Abdullah Ocalan bête rêkirin û piştevanîya KNKyê dê bo wî bête dîyar kirin û herweha şiddet û îzolasyona li ser tête kirin jî dê bête şermizar kirin û azadîya wî bête xwastin.

KNK herweha ji bo germkirina têkilîyên navxweyî dê ji bo rêvebirîya KCKyê, serokê Kurdistana Federal Mesûd Barzanî, serokê Iraqa Federal Celal Talabanî û hemû lîderên Kurd û partî û rêxistinên Kurd û Kurdistanî nameyekê rêbike û ji wan daxwaz bike ku rola xwe ya komkerîya hêzên neteweyî, di vê prosesa dijwar da bi çêkerî bileyizin.

KNK herweha bangî xelkê Kurd û Kurdistana Federal dike ku rêzê nîşanî kêmanîyên etnîk û dînî yên Kurdistanê bidin û rê nedin ku dagîrker tifaqa Kurd û kêmanîyan xirab bikin.

KNK hêvî dike ku Kurdên dîasporayê jî di nav alarmê da bin û di parastina destkevtên neteweyî da hişyar û aktîv bin.

Di 29ê Adara 2009ê da li Tirkîye û Kurdistanê hilbijartinên şehridarî û îdareya bajêran çêdibin. Bi navê xelkê Kurd DTP [Partîya Civaka Demokratîk] tevî hilbijartina dibe. Dewleta Tirk daku rê li ber DTPyê bigire, hemû metodên antî demokratîk bi kar tîne. Dewleta Tirk hemû hêz û îmkanên xwe seferber kirine ku şehridarîyên Kurdistanê bi destê DTPyê ve bernede. Navdarên Kurd ceza dike ku nebine namzet. Bi vê armancê bi lez û bez cezayê giran li Leyla Zanayê hate birîn. Em wekî KNK vê biryara cezayî ya li ser Leyla Zanayê şermizar dikin, piştevanîya xwe ji bo Leyla Zanayê aşkera dikin.

Civata Giştî ya 9. ya KNKyê di nav kombûna xwe da, qetlîama Kerkûkê protesto kiribû û dubare vê kiryara hovane şermizar dikin, sersaxîyê didine malbatan û Kurdistana Federal û ji bo birîndaran jî şîfaya xêrê daxwaz dikin. KNK bihayekî mezin dide bizava jinên Kurdistanê ku bi slogana „em ne namûsa kesê ne, namûsa me azadîya me ye" dayne dest pê kirin. KNK bi hemû hêz û şiyana xwe ve piştevanê bizava jinên Kurdistanê ye. Di encam da KNK bangî xelkê Kurd û hemû Kurdistanîyan dike ku beramberî pêkve êrişên dagîrkeran tifaqa navxweyî vehûnin, biparêzin û pêşve bibin. Serkevtina doza Kurd û Kurdistanê di „Yêkitîya Neteweyî" da ye.



www.arsivakurd.org

Konseya Rêvebir ya KNKê 23.12.2008

# Hevkariya Iran û Tirkiyeyê peşdikeve

Di demên dawî de, êrîşên li hemberî gelê kurd li Bakur û Başûrê Kurdistanê zêde bûne. Dewleta Tirkiyê û dewleta Iranê, bi operasyonên hevbeş yên hewayî û bejahî, bê rawestandin Herêma Federal a Kurdistanê bombarduman dikin.

Di hevkariya operasyonên Tirkiyê û Îranê yên li hemberî Herêma Federal a Kurdistanê de, desthilatdariya Baxdatê Nurî El Malîkî jî cih digire.

Di vê dema ku li Bakurê Kurdistanê operasyonên eskerî têne lidarxistin, li hemberî DTPe û gelê kurd êrîşkeriyên polîs û nîjadperestên tirk têne pêkanîn, li hemberî Başûrê Kurdistanê bombardumanên hewayî û bejahî têne lidarxistin û projeyên sazkariya çeteyên cerdevaniyê dikevine rojevê de, trafîka siyasî û dîplomasiya dijminên gelê kurd jî, di qada herî bilind de zêde bûye.

Di vê dema ku dewleta Tirkiyê û Îranê, li hemberî Kurdan êrîşkeriyên dijwar lidardixin, arîkarê serokkomarê Iraqê, Tarik El Haşîmî çu Enqerê, bi serokkomarê tirk Abdullah Gul û serokwezîrê tirk Receb Tayyip Erodgan re hevdîtin pêkanî. Di 24ê Çile de jî, serokwezîrê Iraqê Nurî El Malîkî jî wê biçe Enqerê û piştre biçê Îranê.

Serokê Grubê parlamenterên kurd yên li parlamena Baxdatê Dr. Mahmud Osman jî, destnîşan kir ku serokwezîrê Iraqê Nurî El Malîkî, êrîşên hevbeş yên Tirkiyê û Iranê ku bê rawestandin têne lidarxistin erê dike û dema diçe dewletên cîran jî, dibin cilê de hevdîtinan dike û xala sereke ya hevdîtinên wî jî gelê kurd e. El Malîkî, bi armanca ku Herêma Federal a Kurdistanê lewaz û zeîf bibe tevdigerê.

Ev jî dide xuya kirin ku, gelê kurd di pêvajoyeke hassas û giring re derbas dibe. Di vê pêvajoya hassas û giring de, dagirkerên Kurdistanê, hemberî ku li dijî hev in jî, di pirsgirêka kurd de, dibine yek û li dijî gelê kurd hevkariyê dikin, êrîşên hevbeş lidardixin.

Di vê pêvajoya hassas û giring de, pêdiviya gelê kurd, bêhtir ji her demê, bi yekîtiya neteweyî heye. Heger gelê kurd, di vê pêvajoya hassas û giring de yekîtiya xwe sazkar neke, ewê li hemberî dagirkerên Kurdistanê, li hemberî hêzên navneteweyî jî lewaz û misrî bimîne.

Baş tê zanîn ku, dijmin her dem, ji parçebûna gelê kurd sûd girtiye. Hêzên navneteweyî jî, ji sedema parçebûna gelê kurd, qinyat û êmnatî bi gelê kurd ne aniye. Ev jî dide xuya kirin ku parçebûn û bêtifaqiya gelê kurd, ziyanên mezin dide gelê kurd, dide jiyana azad a paşerojên gelê kurd.

KNKe, bi armanca parastina destketiyên gelê kurd yên Bakurê Kurdistanê û destketiyên Herêma Federal a Kurdistanê; gelê kurd, hêzên kurd, rewşenbîrên kurd şiyar dike ku li hemberî dijberî û êrîşên li dijî gelê kurd bi ciddîyeteke neteweyî rawestin û bi heman ciddiyetê dijberiya xwe nîşan bidin.

KNKe, bi israr destnîşan dike ku, di vê pêvajoya hassas û giring de, pêdiviya gelê kurd bi 'Yekîtiya Neteweyî' heye. Gelên cîhanê teva yekîtiya xwe ya neteweyî sazkar kirine; gelo çima gelê kurd jî, yekîtiya xwe ya neteweyî sazkar neke?

KNKe, destnîşan dike ku "Yekîtiya Neteweyî ya Kurdan", ji bo paşerojên jiyana azad ya gelê kurd, ji bo parastina destketiyên gelê kurd û ji bo bihêziya desthilatdariyên kurd ya li hemberî hêzên dagirker û hêzên navneteweyî û parastina berjewendiyên neteweyî, hêza herî mezin e.

KNKe, diyar dike ku, Yekîtiya Neteweyî ya Kurdan, hêza hebûna gelê kurd ya li hemberî cîhanê teva ye û garantiya parastina destketî û azadiya gelê kurd e.

www.arsivakurdi.org

Konseya Rêvebir ya KNKê 28.12.2008

# Ji bo pîrozbahiya Sersalê

**Birêzan!**

2008, di têkoşîn û tevgera azadîxwaz a gelê Kurd de, qonaxeke dîrokî bû. Di vê sala giring û hassas de, gelê Kurd bi têkoşîn û berxwedanên mezin û watedar, li çar parçeyên Kurdistanê serketin bidestxist û qonaxên dîrokî derxistin hole. Serketin û destketiyên 2008an, wê ji bo sala 2009an jî, li çar parçeyên Kurdistanê bibin bingeha berdewama serketin û destketiyan.

**Birêzan**

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê, 9mîn Civata Giştî, di 13 û 14ê Kanûna 2008an de, li Payîtexta Yekştiya Ewropa Brukselê pêkhat.

9mîn Civata Giştî ya KNKê, helwesta îroyîn ya cîhanê, pêvajoya siyasî û rewşa Kurdistan û dagirkerên Kurdistanê bi berfirehî û kûrayî nirxand. Di encamê de giringî û pêdiviya 'yekîtiya neteweyî' weke xala sereke derkete pêş û 'Belgeya Stratejîk a Neteweyî' hate erê kirin. Ew gavekî pîroz e.

Di nava destketî û serketinan de, nêzîkbûna gelê Kurd û hêzên Kurd ya di "rastî û pêwistiya yekîtiya neteweyî" de, qonaxa herî giring e. Ev, ji bo paşerojên gelê Kurd şanazî û hêviyeke mezin e. Lê pêwiste bê zanîn ku, sala 2009an biqasî serketin û desketiyan, windakirin û têkçûnê jî di nava xwe de diragire.

Tê zanîn ku di dawiya sala 2008an de dijminên gelê Kurd, car din ketin nava hewldan û tevgerên ku, li dijî gelê Kurd, li dijî Tevgera Azadîxwaz a Gelê Kurd û li dijî Başûrê Kurdistanê, hevkariyên xwe yên kujerî nû bikin. Ev jî mecburiyeta ku Kurd jî, di pêkanîna Yekîtiya Neteweyî de bikevin nava hewldanan.

Bi vê armancê, em dixwazin ku her Kurd, her hêza Kurd, bi hiş û ramanê ku Yekîtiya Neteweyî azadiya gelê Kurd e û gihiştina utopia paşerojên azad û bi rûmetdarî cih girtina di nava malbata cîhanê de ye, tevbigerin.

Pêwiste bê zanîn ku, dijmin di sala 2008an de, di her alî de kete nava zaafiyet û psîkoliyeke têkçûyî. Vê jî îrade û morala gelê Kurd, di radeya herî bilind de derxiste holê. Bi vê mebestê, em ji kesayetî, sazî, dezgeh û hêzên Kurd teva daxwaz û hêvî dikin, ku li nirxên pîroz yên gelê Kurd xwedî derbikevin û bizanibin ku berjewenidyên gelê Kurd, tenê ji aliyê gelê Kurd dikare bên parastin.

Bêguman serketin û destketiyên mezin yên sala 2008an, heyecaneke mezin jî dane gelê Kurd, ku li çar parçeyên Kurdistanê, li meydanên serîhildanan, cîhana ku li hemberî mafê gerdûnî û ademî yên gelê Kurd bêdneg in, bi dengekî bilin û watedar hişyar kirin.

Bi van hest û baweriyan em bang li gel, li kes, li hêz, sazî û dezgehên neteweyî dikin ku li serketin û destketiyên sala 2008an xwedî derbikevin û di sala 2009an de jî, van serketin û destketiyan bêhtirîn zêde bikin, bi hêz bikin.

Bi bawerî û hişmendiyeke ku Yekîtiya Neteweyî azadiya gelê Kurd e, bi dilsozî bikevin nava hewldan û kiryarên xêrdînî û erênî, em sersala we pîroz dikin û serketinê dixwazin.

www.arsivakurdi.org




*Konseya Rêvebir ya KNKê 12.01.2009*

## *Silav ji dayikên Aşitîyê re*

Wan rojan Dyîkên Aşitîye çalakiyên rûniştinê li dar xistin û ev çalakiyên ji bona zimanê kurdî hîn jî berdewam in.

Dayîk, dixwazin bi zimanê xwe bi jîn, Dixwazin zarokên wan bi zimanê Kurdî werin perwerdekirin. Daxwaz dikin ku êdî dewletên dagirker dawî li bişaftina li ser zimanê kurdî bînin û yê herî girîn jî yek jê ew e ku jib o xwendakarên Kurd perwerda zanistî bi zimanê kurdî serbest were berdan û di zagonan de were destnîşankirin.

Zimanê Kurdî yek ji wan zimanê kevnar e û nezî 40 milyon mirov pê diaxivin. Qedexekirina ziman û canda 40 milyon mirov sucê herî mezin e û bê goman rureşiya mirovatiyê ye. Di sêrîde dewlata Tirk ,dewletên dagirker hîn jî vî sucê giran dikin û hîn jî li ser ziman û canda kurdî qedexe, asîmîlasyon û rêbazên tunekirinê berdewam in.

Dewleta Tirk wêcarê li ser nave vekirina TV ya bi kurdî sucdariya xwe hîn zêdekir. Ev sed sal e Zimanê Kurdî tune dît û ji bo tune bibe serî li her rebazê xist. Lê tiştê herî ecep weke ku tiştek nebuye ji sedema rureşî û şermezariyê, ji sedema helwesta gel ê kurd, ji sedema tekoşîna harêkata Azadî ya Kurd, partiya AKP dest bi weşana bi Zimanê Kurdî kir. Bê goman div ê siyasetê de hilê û xapandin heye û diyare ku AKP ji bona hilbijartinan van rêbaza pêş dixe.

Wezîrê Karê Hundir A.Kadir Aksu dibêje zimanê dyîkê weke şîrê dyîkê maf e û helal e. Erê kesê ku vê dibêje ew kesê ku bi salaya siyaseta kujerî bi qerêj meşandiye û hîn jî ev kes berpirsê zilm û kiryarên xerebe. Ev bêrumetî û dirutiya herî mezin e.

TRT 6 ne ji bona pêşxistina ziman û canda kurdiye. Gelê Kurd nayê xapandin.Pêwîste Komara Tirkiyayê dest ji van fen û xapandina berdê. Pêwîste vîna gel ê Kurd nasbike û li gora vê plan û projeyn carenseriye pêşxe. Em azadiya zimanê xwe dixwazin. Heger ziman Azadbe pêşdikevê. Heger ziman û canda me yê giring tir gel ê me ne azadbe wê cawa ziman pêşbikevê. Bo vê sedeme xwepêşandan û calakiyên Dyîkên me bi wate û bi nirxin. Em calakiyên dyîkan silav dikin.

Em cardin zilm û asimlasyona li dewlata tirk ya li ser ziman û canda Kurdan bi tundî şermezardikin. Em dibêjin zimanê me rumeta meye. Rumeta me azadiya meye.

www.arsivakurdi.org

# Konseya Rêvebir ya KNKê kombûna xwe bi sawî kir Piştî kombûnê ev daxuyanî hate belavkirin

Xelkê Kurd, xelkên Kurdistanê ji paşeroja xwe avneh in (emîn in). Bawerîya xelkên Kurdistanê bi doza xwe heye, bi hêvî ne. Hemû xelkên Kurdistanê digel hemû zor û zehmetîyan, dijwarîyan vê bawerîya xwe xurt û saxlem digirin. Kurd û Kurdistanîyan bi van bîr û bawerîyan dest bi sala 2009ê kirin. Lê belê, Kurdistanî herwisa pêşhatinên li navçeyê têne dîtin jî ji nêzîk ve taqîb dikin û li goreyî wê pozisyonê werdigirin.

Îro li Kurdistanê, li ber û piştên cografyaya Kurdistanê bûyerên ne bi xêr û bêyûm pêktên. Bizava neteweyî ya Kurdistanê di nav vê hercûmercê da pêşdikeve. Her pêşkevtina bizava neteweyî û pêkhatina destkevtên li Kurdistanê xezeba dewletên dagîrker dikêşe ser xelkê Kurd û hemû Kurdistanîyan. Dagîrkeran hêj jî xwe ji armanca fetisandina doza neteweyî nedane paş. Planên têkbirina bizava neteweyî di serê rojevên wan da ne. Hem yêk bi yêk, hem jî bi hev ra êrişkarîya xwe ya li ser Kurdistanê didomînin. Bi taybetî

Tirkîye û Îran hem ji reşahî, hem jî ji esmanî bombeyên agir û jahrê dibarînin ser Kurdistanê û telafeteke mezin didine can, mal û xwezayê. Îranê ji bilî van êrişên leşkerî, pêla îdaman jî daye rakirin. KNK bangî dewleta Îranê dike ku hem dawî li van kiryarên xwe bîne, hem jî rê li ber çareserîya pirsa Kurd û Kurdistanê veke û mafên xelkê Kurd digel nimayendeyên Kurd çaresere bike.

Vê gavê serokatîya hukûmeta Iraqa Federal jî daxilî vê prosesa êrişkar bûye. Serokwezîrê Iraqa Federal Malikî ji milekê ve piştevanîya Tirkîye û Îranê dike ku bizava neteweyî ya li bakur û rojhilat bête şkandin, li milekê jî li ser serê Kurdistana Federal ya ku di nav tixûbên fermî ya Iraqa Federal da dek û dolaban dizivirîne. Malikî û piranîya hukûmeta Iraqê ya Erebe, ev demekî dirêj e ku dijî otorîteya hukûmeta Kurdistana Federal ketine nav hewildanên neyarane. Hem nahêlin ku Kerkûk, Xaniqîn û bajêrkên dî bikevin nav tixûbên Kurdistanê, hem jî hêzên leşkerî yên ertêşa Iraqê rêdikine van bajêran û herweha dest pê kirine ji nav Kurdan hêzên çekdar (isnad) jî pêktînin ku hêza asayişa xwumal ya Kurdistanê bê desthilat bikin. Hukûmeta Malikî bi vê polîtîka xwe ya şovenîst ya Erebî tevî êrişkarîya Tirkîye, Îran û Sûrîyeyê bûye dijî Kurdistanê û xelkê Kurd.

Kurd û Kurdistanî îro di nav vê ablûkaya mezin da têkoşîna xwe didomînin. Amerîkayê digel ku di avabûna Kurdistana Federal da destek da xelkê Kurd, lê îro li goreyî berjewendîyên xwe adeta xwe „bêteref“ kirîye ku eve cesaretê dide hêzên Ereb yên şovenîst yên li hukûmeta Bexdayê.

Eve midehek e ku li ser planekî wêranker tête axivtin. Aktorên vî planê ku dixwazin Kurdan bi gotina herî sade „tengav“ bikin, bi hev ra û bi koordîne hereket dikin. Armanca wan ya sereke ew e ku bizava neteweyî ya li bakur û rojhilat bişkînin û hêzên HPGyê ji ber û piştên Qendîl rakin. Tirkîye daku vî planê qirêj bide realîze kirin xwe pêşkêşî Amerîkayê kirîye. Tête xwastin ku bi vê stratejîya ablûkakirin û paşê jî belavkirina hêzên HPGyê, projeyên xwe yên teslîmîyetê li ser Kurdan ferz bikin.

Xelkê Kurd û Kurdistanî vê armanca dagîrkeran dizanin û li beramberî wan têkoşîna xwe didin. Lê Kurd gava di nav vê prosesa wêranker da rola Amerîkayê jî dibînin, mecbûr in bipirsin. Amerîka hem bi slogana „demokrasîyê“ hate Rojhilata Navîn, hem jî îro bi vê tifaqa digel Tirkîye û Malikî, ma ne di nav paradokseke kûr da ye? Em wekî KNK daxwazê ji serokatîya nû ya Amerîkayê û serok Obama dikin ku xwe ji vê paradoksê derêxin û herweha wî heqî di xwe da dibînin ku bêjine wan vegerine ser



www.arsivakurdi.org

armanca „Rojhilata Navîn ya demokratîk“ ku eve bi tifaqdarîya Kurdan mumkun dibe.

Di vê tabloya reş da, rol dîsa ve dikeve ser milên Kurd û Kurdistanîyan. KNK gelek aşkera dixwaze bala hemû Kurd û Kurdistanîyan bikêşe ser vê tehlîkeya ku dagîrker pê rabûne. Neku pratîk, nîyeta tesfîyekirina hêzên gerîlla bi serê xwe alarma felaketê ye li navçeyê. KNK naxwaze bîne bîra xwe ku Kurdek bibe hevkarê vî planê neyarane û weşartî. Digel hindê jî KNK dixwaze rojên reş yên „şerên navxweyî“ bîne bîra hemû Kurdan ku çawa dijminan ji wan şeran istifade kirin, Kurdan çawa jê zerar û zîyan dîtin.

KNK wekî hercar banga xwe ya pêkînana yêkitîya neteweyî dike û ji bo vê armanca pîroz jî teklîfa xwe ya komkirina konferanseke neteweyî dubare dike ku di „Belgeya Stratejîya Yêkitîya Neteweyî“ da jî wekî xaleke bingehîn cih girtîye. Divêt Kurd hişyar bin ku neyarên Kurdan konferansên ku Kurdan berdin hev pêkneynin. Konferansên ku „birek Kurdan“ li hev kom dikin, esasen dibe sebebê belavkirina Kurdan û şik têda nîne ku eve xizmeta polîtîkên dagîrkeran dike. Konferansên ku xizmeta yêkitîya neteweyî dikin divêt bi îradeya Kurdan bi xwe bêne kom kirin. KNK amade ye ku digel hemû dînamîkên neteweyî konferanseke Kurd û Kurdistanî organîze bike.

KNK di nav vê prosesa dijwar da dixwaze bala Kurdan bikêşe ser hilbijartinên li Tirkîye û Kurdistanê jî. 29ê Adarê hilbijartinên şehridarîyê çêdibin û bi navê xelkê Kurd û Kurdistanîyan DTP beşdarî hilbijartina dibe. KNK giringîyeke mezin dide van hilbijartina. Şehridarî, di nav van şertên zordarîya dewleta Tirk da jî bin, merkezên xwe bi xwe îdarekirinê ne. Hindî ku rêvebirina bajêrên Kurdistanê bi rêya van şehridarîyan bikeve destê Kurdan, bizava neteweyî dê hind pêşbikeve, çeperên nû bi dest bêxe beramberî rejima dagîrker ya Tirk. Bi vê şuûra neteweyî em bangî xelkê xwe dikin ku li rehîya xwe xwudan derkevin û îdareya şehridarîyên bajêrên xwe bi destê namzetên dewletê ve bernedin. Bi destxistina her şehridarîya bajêr û bajêrkên Kurdistanê, dê armanca rizgarî û azadîyê nêzîk bike.

KNK şiddeta li ser Ocalan jî şermizar dike û bangî dewleta Tirk dike ku rê li ber azadîya Ocalanî veke û herweha daxwazê ji Kurdistanîyan ji dike ku li ser pirsa Ocalanî bi baldarî rawestin.

Di dawîyê da KNK bangî dewlet û hêzên demokratîk, humanîter û xêrxwaz yên cîhanê jî dike ku piştevanîya bizava neteweyî û demokratîk ya xelkê Kurd û Kurdistanîyan bikin. Bi taybetî Dewletên Yêkbûyî yên Amerîkayê (USA), Yêkitîya Ewrûpayê (YE), divêt li normên xwe yên demokratîk xwudan derkevin û destekê bidine xelkê Kurd û Kurdistanîyan. Îlankirina rêxistinên Kurd bi nave “terorîstî” xizmeta çareserîyê nake.

Çareserî bi dîyalogê dest pê dike. Ev daxwaze di “Konferansa YE, Tirkîye û Kurd ya 28-29 Çile 2009ê” da jî bi dengekî bilind hate gotin û herweha hate xwastin ku PKK ji nav “lîsteya terorê” bête derêxistin. Heke Amerîka û YE dixwazin rê li ber çareserîyeke demokratîk vekin, berî hertiştî divêt rêya dîyaloga digel rêxistinên Kurd vekin û digel wan di nav têkilîyê da bin. Di vî warî da rolek jî dikeve ser mile Rêxistina Neteweyên Yêkbûyî (UN) jî ku di navbeyna berpirsiyarên xelkê Kurd û Kurdistanîyan û dewletên dagîrker yên Kurdistanê da navbeynkarîyê bike ku rê li ber pêkhatineke maqûl vebe

www.arsivakurdi.org

*Konseya Rêvebir ya KNKê 10.02.2009*

## *Ew komploya Navnetewî Şermezar Dikin*

Ew komploya navnetewî ku li dijî tekoşîn û rûmetên gelê me hatibû despêkirin, îro jî bi şêweyên cuda berdewam dike. Em weke KNK, ew lîskên gemar ên di 15 ê Sibata 1999 da despêkiribû û nuha hîn jî bi rengên cuda berdewam dike, em bi tundî şermezar dikin. Em plangeran bi nefret mahkûm dikin û em silavê li gelê xwe yê li dijî vêna berxwedide dikin.

Di 15 Sibata 1999'an da ku ji bo gelê Kurd weke "Roja Reş" e, bi plangeriyek e navnetewî Rêberê gelê Kurd rêzdar Abdullah Öcalan dîl hate girtin û di kesayatiya wî de li dijî gelê me konsepta berfireh û bi gemar a tunekirinê hate despêkirin. Ev komplo û hêzên di vê komployê de cih girtin ku, hemû rûmetên mirovatiyê û huqûqê navnetewî xistin bin piya û pêkanîn, lê di 10 mîn salvegera xwe de, di encama berxwedan û her çi dibe bila bibe xwedîderketina bi israr li Rêberê xwe ya gelê me, nehişt bigihêje armancên xwe. Gelê me îro vê serkeftina xwe jî kêm dibîne û xwe kilît kiriye bi armanca azadkirina rêzdar Abdullah Ocalan ra. Hêzên ku, xwestin bi vê dîlgirtina Rêzdar Öcalan a bi vê komploya qirêj û derveyî huqûq û ne rewa ra, Tevgêra Azadiya Kurd hilweşîn e, ku bi serneketin, nuha jî êşkenceyek e bi pilan û bi rêxistinî pêktînin. Êrişkariyek e piralî; ya bîrdozî, siyasî, psikolojik û fizikî hemiyan bi hev ra didin meşandin. Bi vê kiryariyê jî, dixwazin Rêzdar Ocalan bêdeng bikin û ji gel bi qetînin. Li himberî vêna, dîsa di serî de Rêzdar Ocalan û gelê me bi hev ra, ev 10 sal e berxwedan û tekoşîna xwe her bi xurtir didin meşandin.

Rêzdar Ocalan tekoşîna xwe ya jibo çareserkirina bi aşîtî û demokratik û adil a pirsgirêka Kurdan her berdewam dike, lê di qonaxa nuha da azadbûna Wî, ji her demê bi leztir pêwist e. Erkek e li ser milê her hemwelatiyekî Kurd, ku bi ruhê yekîtiya netewayî û rûmetê di kesayetiya Rêzdar Ocalan da li tekoşîna Kurd xwedî derkeve. Gûman nîne ku armanca pilangeran, bi tenê ne Ocalan bû, belê di kesayetiya Wî de, hêviya gelê me bişkîne, xeyalên gel vala derxîne, moralî gel xera bike, hemî deskeftiyên gel tune bike û li ser vê bingehê sistema xwe ya nenaskirin û tunekirinê bide berdewam kirin. Bersîva herî hêja ya gelê me eve ku, li dijî van derdorên ku di komploya Rezdar Ocalan da bi hevkarî tevgeriyan e, li ser bingeha yekîtiya netewayî xwe bi rêxistin bikin û helwesta pêwîst nîşan bidin.

*Konseya Rêvebir ya KNKê 05.03.2009*

## *Raperina pênçê adarê li gelê me piroz be*

Bi rashatina roja raperîn û serhildana gelê me di başûrê Kurdistanê de em pirozbayî li hemû gelê me yê Kurdistanê yê kedkar û qehreman dikin. Bi hêviya ku ev roj bibe bingihek ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd bi rêyên demokratik û aştiyane di parçên din yê Kurdistanê de .

Ev dema ku em têdene, li ser hemû hêzên Kurdan ferze ku bi rihê raperînê kar bikin; ji bona parestina deskeftiyê kurda di her çar parçê Kurdistanê de. Em bang li hemu hêzên kurda dikin xwedî li rihê raperin û serhildanê derkevin. Em hevi diken ku raparin bibe bingehe yekitiya netewî u danîna stiratîjiyek netewî ya mainde.Bi vê minasabete em carake din helwestê dijmin yê êrîşkar û hovane li ser gelê me û netewa me şermezar dikin. Bangawaziya wan diken ku dest ji siyaseten xwe ye qirêj berdin û hurmetlihember gele me û mafên wî bigrin.

Di dawî de em bang li hemu gêlê kurd û saziyê wê dikin ku bi rihê berpirsyaretiya netewî tev bigerin û bi hêviya rojên azadIro pênçe adarê roja damezrandina PÇDK ye ji. Bi rasthatina roja damezrandina partiya çareseriya dimokrati Kurdistan (PÇDK)em rêvebrî, kadir û layingerê wê piroz dikin û hêviya serkeftinê di kar û xebatên wa de dixwazin .



www.arsivakurdi.org

Komisyona Jinan a KNKê 08.03.2009

# Bİ YEKÎTÎYA XWE EM Ê BİHÊZ BİBİN, Bİ HÊZBÛNA XWE EM Ê AZAD BİBİN

Roja jinên kedkar yê cîhanê 8 Adarê, di tekoşîna jinên kurd yên jibo kedê û azadiye de yek ji wan rojên heri girîng yê cejna berxwedaniyêye. Rexmê zilm û zordariya hêzên dewletê, dyîk û jinên kurd yen leheng ku li qadan serkeşiya daxaziyên Azadiyê dikin em wan bi rêz slavdikin. Ji bo 8 Adarê tiştê heri guncav berxwedan e. Jinên kurd ji weke wan jinên leheng yên ku raxmê kuştin û şewtandinê 1857 de li New York e li dijî zilm û zordariyê ketibûne berxwedanê, jinên Kurd jî îroj li qadane.

Ev roj, ji herkesî zêdetir jinên kurd, daxwaziyên Klara Zetkin û yen jinên Şoreşger bi cih tînin.

Di salvegera 8 ADARÊ de, Ji bo ked û tekoşîna azadiyê wan kese bi lehengî li berxwedan a di kesayetiya yên weke Clara Zetkin, Mina Qazî, Leyla Qasim, Rewşen Bedirxan, Zîlan û Bêrîtanan de em tev ê şehîdên jin bi rêz bi bîr tînin.

Jinên Kurd hem ji bo nasnama jin û hem jî jibo tekojina nasnameya neteweyî ya demokatîk hêza bingehîn e. Jinên Kurd li gel zilm û îşkenceyê li dijî siyaseta koletî, înkar û tunekirinê ya dewletên weke Tirkiyê, İran û Suriyê li ber xwe didin. Ev dewletên dagirker bi hêzên navnetew yên rojavayi re hewldidin ku yekîtîya gele me çênebe û havpeyvînên aşîtîxwaz pêşnekevê. Bê guman sere vê siyasetê dewlata Tirk dikişîne. Dewlata Tirk bi hêzên Başurê Kurdistanê re dixwazê Kurdan bi Kurdan bide Kuştin. Ji bo ev daxwaziya dewlata Tirk pêş nekevê em daxwaz dikin ku Rêveberiya Başurê Kurdistanê siyaseteke zelal û ji gel re vekirî bkmeşîne. Em weke gele Kurd û jinên Kurd naxwazin qedera xwe bisipêrinîn kesekî.

Li aliye din di civaka me de hîn ji em jinên Kurd di bin serdestî û hişmendiya desthilatdariya zilaman de ne. Li ser navê kujeriyên Namusê jin ten kuştin, şewitandin û neçari xwekuştinê têne hiştin. Li Başurê Kurdistanê kiryarên derveyî serdemî ên weke pirjinî hate fermîkirin. Ev hişmendiya kevneperest bi pişgiriya siyasetê tê rewa kirin.

Em baş dizanin ku çavkaniya hişmendiya zordarî û mêtingerî ya ku li ser jinan tê meşandin û ya hişmendiya metingeriya giştî ya ku li ser tevê cıvakê desthılatdar û mêtinger re yek e. Herdu ji xwe dispêrin e hişmendiya serdestiya zilam ya ku berhemên pergala Kapîtalîzmê ne. Ev Pergala kapîtalîst jî heroj metîngerî, şer, pevçûn û dagirkeriyê di hilbêrê û çiqas diçe di tekçûnê de kûr dibe. Ev weke kayranên Aborî li her cihî derdikeve hole. Ji sedemê hêrsa kar û bê dawî mêtingerî êdî li vê cîhanê nayê jîyin.

Li ser navê sazûmaniya nû ya cîhanê , serkêşê sîstemê DY Emerîqa û Y. Ewrupa xwe di Rojhilata Navîn Kurdistanê de bi cih kirine û hewl didin ku ji vir şer,pevçûn, xara kirin û tevlîhevîye belav bikin. Ji bo sedemê, yekîtiya me ya neteweyî tehlûke dibînin. Êdî herkes dizanê ku dixwazên Kurdan li gora berjewendiyên xwe bi kar bînin.

Êdî pêwîst e jinên Kurd li herçarparçan yekîtiyê xwurt bikin û ji bo azadiyê têbikoşin.

Dîsa divê jin bi yekîti û xebatên xwe siyaseta dagirkerî û ya parçekirin û desthilatdariyê vala derbixin.Bê guman encam û bandoriya tekoşîna me ya ji bo nasnameya jinê û ya Kurdîtiyê bes herêmî nîn e, global e jî. Serkeftin û binkevtina sîstema serdest û mêtinger bi tekoşîna me ya azadiyê ve girêdayî ye.Di çareseriya pirsa Kurd de hêza sereke vîna gelê me ye.

Em bangawazî li tevê jinan dikin; da ku ji bona lêxwedîderketina vîna xwe tevlî hilbijartinên herêmî yên 29 Adarê bibin û ji bona pêşerojên Azad û Demokratîk dengê xwe(reyên xwe) ji DTP re bi kar bînin û pişgirî û alîkariya DTPê bikin.Jibo yekîtiya neteweyî û ji bo tekoşeriyeke xurtir û çalaktir, em tevayê Jinên Kurdistanî wedixwînin tevlîbûna roja 8ê Adara 2009an.. Em bangî jinên Kurdistanî dikin da ku pişgirî û alîkariye bidin Stiratêjiya Yekîtiya Neteweyî ya Demokratîk a KNKê.Em weke haval hogirên we yên jin Roja jinên Kedkar ê cîhanê 8 Adarê bi hestên xweş û geş li we pîroz dikin.

www.arsivakurdi.org




***Konseya Rêvebir ya KNKê 12.03.2009***

## *Di salvegera 5 emîn a Komkujiya Qamişlo de em yekîtiya xwe ya neteweyî bi hêztir bikin*

Di ser komkujiya ku dewleta Suriyeyê li Qamişloyê, li dijî gelê me pêk anîbû 5 sal derbas bûn, ev komkujî bû sedema jidestdayîna jiyanên 30 welatparêzên Kurd. Em, wan hêzên ku ev komkujî li dijî gelê me pêk anîne, bi tundî şermezar dikin û welatparêzên ku jiyanên xwe ji dest dane bi rêzdarî bi bîr tînin.

Wek tê zanîn rêveberiya Şamê heta niha di ti warî de ku di nav de babeta kesên zindankirî jî heye, soza xwe bi cih neaniye û li gel dewletên wek Îran û Tirkiyeyê di înkar û îmhaya Kurdan de bi israr e.

Rejîma Suriyeyê herî dawî dîsa li siyaseta xwe ya „Kembera Erebî" vegeriyaye û dixwaze başûrê rojavayê Kurdistanê ji Kurdan xalî bike û Ereban li şûna Kurdan bi ç bike, wisa jî provaya komkujiyên nû yên wek li Qamişloyê dike.

Divêt ev bê dîtin ku ev kiryarî dibe sedem ku biratiya ereb û Kurdan têk biçe. Eger fersenda çareseriya demokratîk ku dê bibe sedema pêşketin û geşbûna biratiya kurd û ereban baş neyê bikaranîn, wek di serpêhatiya pergala Iraqê û ya Saddam de jî derket holê, dê ti sûdê nede pergala Suriyeyê jî. Eger di polîtîkaya xwe ya nijadperestî û neteweperestî de bi israr be, wê xesara herî mezin jî ew bi xwe bibîne. Divêt pergala Suriyeyê bizanibe ku gelê kurd ne bi tenê ye, divêt bizanibe ku kurd di hawîra herêmê de hêzeke girîng e û yekser dawî li êrîşên xwe yên li ser gelê me bîne. Ji ber vê jî divêt dewleta Suriyeyê dawî li dijminahiya ku bi dewletên Tirkiye û Îranê re li dijî gelê me dike, bîne û girîngî bi dostaniya dîrokî ya di navbera herdu gelan de bide, divêt polîtîkayeke demokratîk bi pêş bixîne.Gelê me yê welatparê; em dibînin û dibin şahid ku li her parçeyên welatê me hema bigir di heman demê de polîtîkayên komkujiyê tên duristkirin. Bi van hewldanên komkujiyê re tê xwestin ku destkeftinên gelê me yên demokratîk têk bibin, gelê me biçewsînin, çavtirsî bikin û vîna wî bişkînin.

Ji bo gelê me bi awayekî pir zelal derketiye holê ku li her parçeyan li dijî van êrîşan tekane rê yekîtiyeke demokratîk a neteweyî ye, pêşxistin û zexmkirina piştgirî û hevkariyê ye.

Herwiha divêt bi mebesta 5. Salvegera Komkujiya Qamişloyê, êrîş ji ku û ji çi hêzê tê bila bê, divêt li her derê cîhanê em yekîtiya xwe ya li ser bingeha demokratîk û neteweyî li dijî her cûre zext û çewsandinê bidin nîşan. Bi taybetî jî gelê me yê li başûrê rojavayê Kurdistanê divêt li dijî komkujiyan bêje „êdî bes e" û serhildanên xwe bilind bike; i ser bingeheke aştiyane, demokratîk û wekhevî û azadî biratiya di navbera ereb û Kurdan de geştir bike, ev wezîfeya li pêş wî ye.



www.arsivakurd.org

Konseya Rêvebir ya KNKê 16.03.2009

## Ji bo Helepçeyên nû çênebin pêwist e em bi rêxistin û bi hêz bin

Di 16 heyva Adara sala 1988 de Rejîma Faşîst a Iraqê bi çekên kîmyayî êrîşî Helepçe kir. Bi hazaran kesên bê tawan ku piranîya wan jin û zarokbûn bi bombayên jahrê hatin qetilkirin.

Di 16 heyva Adara sala 1988 de Rejîma Faşîst a Iraqê bi çekên kîmyayî êrîşî Helepçe kir. Bi hazaran kesên bê tawan ku piranîya wan jin û zarokbûn bi bombayên jahrê hatin qetilkirin. Em li ser navê KNK`ê şehîdên Helepçe bi birtênin û jibo gelê Kurdistanê sersaxîyê dixwazin.

Ev êrîşa komkujiyê li ber çavên cîhanê pêk hat. Dîmenên vê komkujiyê bi taybetî jî dîmenên wan dyîkên ku xwestine zarokên xwe di himêzaxwede bi parêzin tu carî jî nayên ji birkirin.

Di herêma Rojhilata Navîn de herî zêde gelê Kurd zilm û zorê dibîne û di walatêxwe de ne xwediyê tu mafaye.Gelê kurd yek ji wan gelê kevnar yên herêmêye. Xwediyê ziman û çandeke mezin e. Gel ê Kurd jî weke wan gelê herêmê mafdar e da ku di walatêxwe de jiyaneke azad û bi rumet bijî. Tekojîn û berxwedana gelê Kurd jibo azadîyê ye.

Ev helwesteke rewaye. Raxme zilm û komkujiyan, gelê Kurd li berxwedaye û hebûna xwe berdewamkiriye. Belê, berpirsên kiryarên Komkujiya Helepçeyê rejîma Baas ya Iraqê ruxiya û tawanbariya wan hate darazandin, lê ew siyaset û helwesta dewletên dagirker ya zilm û komkujîyan hin jî berdewame. Li ser gelê Kurd li ser tevgera azadiya gelê Kurd konseptên xeter yên komkujiyên nû ten amadakirin. Dewletên dagirker hewldidin ku destkeftiyên gelê kurd yên di encama bedelên giranbiha de bidest xistine şunde bigrin û cardin gelê Kurd dibin desthilatdariyeke xirab de bê vîn bikin. Lê êdî ev siyaseta înkar û tune dîtina mafên gelê Kurd bê encame. Gelê Kurd tu carî wê qabulnake, wê tekoşîna azadî û ya demokrasiyê xurtirbike.

Di vê pêvejoyêde yekîtî û hevkariya gelê Kurd pir girîng e. Jibo parastin û pêşvebirina destketiyên gelê Kurd yekîtî û hevkariya hêzên gelê Kurd pir girîng e. Em bangawazî tevî hêzên kurda dikin ku bi zanîna dîrokî tevbigerin, yekîtî û hevkariya xwe xurtbikin, da ku bikaribin li beremberî kiryar û siyasetên dewletên dagirker rawestin û bi karibin pirsgirêkên gelê Kurd çarenser bikin.

Em weke KNK cardin bangawaziya dewletên dagirker dikin, da ku dev ji siyaseta xwe ya Komkujî û ya çawsandina vîna gelê Kurd berdin û mafên gelê Kurd nasbikin.

Em hewl bidin jibo Helepçeyê nu çênebin. Em hewlbidin aşîtî û biratiya gela bêsazkirin.

Em car din Komkujiya Helepçe bi tundî şermezardikin û tevê şehîdên xwe bi rêz bi bîrtênin û sersaxiya gelê xwe yên Helepçe dikin.

Bijî Tekoşîna Azadiya Gelê Kurdistan

www.arsivakurdi.org




Konseya Rêvebir ya KNKê 20.03.2009

## Ji bo pîrozbahiya Newrozê

Newroz vejîna neteweyî, berxwedan û yekîtî ye. Gelê kurd ji 2600 salan zêdetir e ku agirê Newrozê ji Kawayê Hesindar wergirtiye û li hember zilm û zordestiyê heta îro geş kiriye. Newroz roja pîroz a vejîna neteweyî, berxwedan û yekîtiya gel e.

Di heman demê de Newroz di nava gelên Rojhilata Navîn de roja şînhatina biratiya gelan e û bi wî awayê tê pîrozkirin. Niha jî hêzên serdest û zordest bi polîtîkayên xwe yên şer dixwazin gelan bi hev bidin şer û dostaniya gelan ji holê rabikin. Em jî li hember van polîtîkayan Newrozê nirxeke giranbuha dibînin û wekî cejna biratî û aştiyê pîroz dikin.

Gelê me ji bo ku sala 2009'an bibe sala aştî û azadiyê û giyana berxwedana 2600 salî her bidome û doza kurdî bi riya demokratîk çereser bibe îradeya xwe beyan dike. Îro em dibînin ku bi saya berxwedana gelê kurd çareseriya dozê hatiye xala dawîn. Bi sedsalan e zimanê me, çanda me înkar dikin û şerê îmhayê li ser gelê kurd dimeşînin. Wan hêzên ku heta niha van polîtîkayên înkar û îmhayê dimeşandin îro mecbûr mane navê pirsgirêkê danîne û qebûl kirine. Gelê me hêzên kedxwar mecbûr kiriye ku nasnameya wî nas bikin.

Em dibêjin ku di roja vejîna neteweyî û berxwedanê Newrozê de bila gelê me li hember gotinên hêzên herêmî û navneteweyî yên wekî 'konferansa neteweyî' şiyar bin.

KNK hingiya ava bûye heta niha ji bo ku îradeya azad a navbera partî û rêxistinên Kurdan derê meydanê û konferansa neteweyî li dar bikeve her tim di nava hewldanan de bûye. Yekîtiya neteweyî divê ku ji bo azadiya gelê kurd û li ser bingeha xizmeta neteweyî bê birêxistinkirin û bê pêşxistin.

Gelê kurd dê bi Newrozê re bi berxwedana xwe dê tekoşîna azadiya xwe her bilind bike û çarenûsa xwe bi destê xwe diyar bike. Em wekî KNK di roja Newrozê ya pîroz şehîdên me yên ku di riya azadiyê de canê xwe dane bi bîr tînin û em wan bi rêzdarî silav dikin û em dibêjin bila Newroza gelê me û gelên bindest pîroz be.

www.arsivakurdi.org

*Navenda Çapemeniya KNKê 28.03.2009*

## *Weke tê zanîn li Tirkiyeyê, di 29ê Adara 2009´an de hilbijartinên herêmî çêdibin*

Hemû partî ji bo ku biserkevin ketine nava xebata piralî û dijwar. Hema hema hemû şîroveger û rayedarên siyasî qebul dikin ku nakokî û pêşbirka mezin û balkêş di navbêna AKP û DTP de dimeşe.

Bi taybetî jî li Kurdistanê mirov dikare bibêje, hilbijartin bi tenê di navbera du partiyan de dê bîbe. Heta ne bi tenê di navbêna du partiyan (AKP û DTP) de, di navbêna DTP û dewletê de derbas dibe. Ji ber ku li Kurdistanê hemû partiyên sîstema dewletê jî piştgriya AKPê dikin.

Bi giranî di serî de arteş û hemû saziyên fermî yên dewletê, yên çekdar û yên ne çekdar eşkere, ji bo serkeftina AKP dixebitin. Li gel van sazî û dezgehên fermî yên dewletê, bi piranî saziyên din yên qaşo ne fermî bi dewletê re nin û medya gişt alikariya AKP dikin.Li gel vê eniya dijber a mezin û berfireh jî, dîsa amadekarî û xebata DTPê gelekî hêja ye û xurt e. Ji xwe li bajar û navçeyên Kurdistanê DTP gelekî li pêş ve tê xuyakirin. Belê li hinek bajar û bajarokên Tirkiyeyê jî gûman heye ku DTP biserbikeve.

Eger bi vî awayî berdewam bike, DTP di hilbijartinan da dibe xwedanê destkeftiyên hêja. Ev jî tê wateya têkçûna siyaseta xerabkar a dewletê ya ku 85 sal e, li ser Kurdan tê meşandin.Li beramberî vê xurtbûna bi rêxistinbûyîn û peşkevftina siyaseta gelê Kurdistanê, AKP û bi giştî Dewleta Tirkiyeyê gelekî nerihet e.

Lewma ji bo di hilbijartinan da DTP bisernekeve, çi lîstok, fêlbazî, hîlekarî û heta kotekî hebe, dikin.

Hêz û hebûna dewletê hemî bi kar tînin. Heta ji bo ku di asta bilintirîn de viyana gelê Kurdistanê bixe destê xwe, ji bo bi navê hemû Kurdan konferansekê li dar bixin, di nava amedakeriyeke berfireh de ne. Di vê demê de hevditinên Mam Celal û Abdullah Gul jî parçeyek ji vê siyaseta bêxêr e.

Em weke KNK, di vê pêvajoya giring û nazik de, eşkere li dijî vê siyasta xerabkar in û pir zelal parastina siyaseta ku berjewendiyên gelê me têdeye, dikin.

Li ser vê bingehê di hilbijartinan de, em piştgiriya DTP dikin. Herwiha em hêvîdar in ku dostên gelê me jî, di piştgiriyê de, wê xemsariyê nekin.Em bang li raya giştî ya cîhanê jî dikin, da ku piştgiriya siyaseta dewletên dagirkerên Kurdistanê û bi taybetî jî ya Dewleta Tirkiyeyê nekin.

Bi taybetî em bang li gelê xwe yê derveyî welat dikin ku di alikariya têkoşîna gelê me yê welêt de, xwe sist nekin, ji hemû teknolojiya pêşketî sûd bigrin û bi kar bînin, alikariya xwe xurtir bikin. Heta deqiqeya dawî jî bixebitin û heta piştî hilbijartinan jî ne rawestin.

Her destek û alikariya xwe bidomînin. Dubare be jî, dîsa em daxwaziyek (bîranînek) biçûk lê giring jî ji gelê me û DTPyiyên li welat jî dikin, ew jî ev e; divê parastina sindoqan pir xurt were kirin.

Em dîsa bawerî û piştgiriya xwe ya bi DTPê re dubare dikin. Em hêvî û bawer dikin ku ev viyana hêja û birûmet a gelê me bidest xistiye êdî nema têk diçe.

Li beramberî hemî xerabkariyan jî, dîsa her gelê me dê di hilbijartinan da biserkeve!

www.arsivakurdi.org



*Konseya Rêvebir ya KNKê 31.03.2009*

## Gelê me, di hilbijartinên herêmî yên 29ê Adarê de biserket

Em vê serkeftinê, ne bi tenê serkeftin û deskeftina gelê me yê Bakûr dibîn in. Belê di pêşengiya DTPê de weke deskeftina Kurdên her çar perçeyên Kurdistanê û Kurdên li derveyî welat jî dibînin.

Lewma em weke KNKê, çawa berî hilbijartinan me piştgiriya xwe di kesayetiya DTPê de ji bo Kurdan diyar kir, em niha jî, ji bo vê serkeftinê hemû Kurdan pîroz dikin û piştgiriya xwe berdewam dikin.

Belê divêt Kurdên hemû perçan û yên her deverê û bi taybetî jî Hukumeta Herêmê ya Başûrê Kurdistanê, vê deskeftiyê weke destkeftiyên xwe pîroz bikin û biparêzin.

Herwiha, divêt êdî, hemû dewletên herêmê û yên cîhanê, bi taybetî jî yên dagirker, vê îradeya/vîna gelê me ku eşkere derketiye hole nas bikin û rêzê lê bigrin. Ew siyasetên xerab êdî xêrê nade xwediyê xwe jî, divêt bi lez dev jê berdin. Divêt herkes li ser siyaseta rast a çareseriyê tîne ya ku gelê me jî dixwazê werin ba hev, ew jî ev e: Siyaseta aştîxwaz, azadîxwaz û demokrat e.

Êdî gelê Kurd, çi dixwaze û çi naxwazie, pir eşkere û zelal got, dibêjê û li ser vê daxwaziyê îrada xwe jî beyan kir.

Bêgûman divêt berî her kesî û her hêzê, gelê Kurd ji niha û pê de, li van deskeftiyên xwe xwedî derkeve û ji bo ku li seranserê Kurdistanê bi serkeve, hîn xurtir bixebite, hewl bide û xwe rêxistin bike.

Em dibînin ku êdî em derbasî qonexeke nuh dibin.

Em bi hêvî nin û bawer dikin ku gelê me, dê van deskeftiyên xwe yên bi rûmet û heja bi parêze.

Em jî weke KNK, careke din serkeftina gelê xwe pîroz dikin û her dem, heta azadbûnê em bi tekoşina gelê xwe re ne.



www.arsivakurdi.org

***Komîsyona Ziman, Perwerde, Çand û Hunerê ya KNKê 04.04.2009***

*Komisyonê kombûna xwe di 4ê Nîsana 2009ê da kir û ev biryarên li jêr standin. Em bi giringî pêşkêşî bîr û rehîya Kurdistanê dikin:*

**1.** Digel hemû pêşveçûnên li Kurdistanê, ziman, kultur û hunera Kurdî hêj jî, bi gotina herî nerm, di bin tehlîkeya lawazkirinê da ye. Asîmîlasyona li ser ziman, bi metod û teknîkên nû tête domandin. Çand û hunera Kurdî herwisa di bin tedayeke jenosîdal da ye. Bi taybetî dewleta Tirk, herweha Îran û Sûrîye jî beramberî ziman, çand û hunera Kurdî hêj jî hemû rengên qedexetîyê didomînin. Li van dewletan perwerdeya bi Kurdî hêj jî qedexe ye.¬ Zimanê Kurdî heta ku nekeve nav sîstemê perwerdeya fermî ya dewletê pêşnakeve û ji ber asîmîlasyonê xilas nabe. Lewma divêt li van dewleta armanc ew be ku zimanê Kurdî bibe zimanê fermî û ji dibistana seretayî heta zaningehê li hemû xelekên perwerdeyê û di nav sîstemê îdarî yê dewletê da bête bi kar înan. Heta ku digihine vê armancê divêt xebat û têkoşîn neyê sist kirin û bi hemû rengan bête domandin. Digel vê prosesê, Kurd bi xwe jî divêt di nav parastin û jîyandina ziman da bin. Bi taybetî li bakur şehridarîyên Kurdistanê divêt hemû îmkanan bi kar bînin û li goreyî şert û îmkanan her bi çi rengî be zimanê Kurdî bi kar bînin.

**2.** Li Kurdistanê û meydanên dîasporayê ji bo bi kar înana ziman, divêt kar û xebatên perwerdeyî, çandî û hunerî bêne kirin û ji bo vê yêkê dezgeh û organîzasyon bêne ava kirin.

**3.** Di nava jîyanê da edetê Kurdî axivtinê divêt bête xurt kirin, pêşve birin û mayînde kirin

**4.** Navên tax, gund, bajêrk û bajêran divêt bi Kurdî bêne gotin. Herwisa navê Kurdistanê divêt bi israr bête bi kar înan.

**5.** Dijî talankirina muzîka Kurdî divêt tedbîr bêne standin. Bi vê armancê dê li ser vê rewşa muzîka Kurdî sempozyumek bête organîze kirin. Herweha stranbêjên ku xizmeta talankirina muzîka Kurdî dikin û muzîka Kurdî dikine Tirkî, Farisî û Erebî divêt bêne boykot kirin.

**6.** Dîlan û govenda Kurdî divêt bête parastin û rê li ber Tirkkirin, Fariskirin anjî Erebkirinê bête girtin.

**7.** Hersal di peryoda "Cejna Zimanê Kurdî" ya di rojên "14 – 15 - 16ê Gulanê" da konferansa zimanê Kurdî û aktîvîteyên bi vî rengî bêne kirin.

**8.** Ji bo plankirina kar û xebatên li ser ziman, perwerdeya zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî, organîzekirina zimanî û amadekirina materyalên perwerdeyê, îsal li payîzê li Berlînê dê "Şûraya zimanê Kurdî, perwerdeya zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî" bête kom kirin.

**9.** Medyaya Kurdî ya nivîskî û elektronîk ji bo agahdarkirin, hişyarkirin û serwextkirina xelkê Kurd ya di warê axivtin û bi kar înana zimanê Kurdî da divêt zêdetir program, nûçe û nivîsan biweşînin.

**10.** "Cejna Zimanê Kurdî" ji îsal pêve bû sê roj. "14ê Gulanê" wekî "Roja Cejna Zimanê Kurdî" 2006ê bi biryara KNKyê hate qebûl û îlan kirin. Cara ewil 14ê Gulana 2007ê li seranserê Kurdistanê û meydanên dîasporayê hate pîroz kirin û ev edete di 14-15ê Gulana 2008ê da jî bi "Konferansa Zimanê Kurdî ya li Berlînê" dom kir. Ji ber asîmîlasyona salan û qedexeya bêhnçikêr ya li ser zimanê Kurdî, "14ê Gulanê Cejna Zimanê Kurdî" ji teref xelkê Kurd ve bi germî hate qebûl kirin û bi coş û heyecaneke mezin hate pîroz kirin. Xelkê Kurd ev cejne wekî çeperekî xurt yê parastina zimanê Kurdî qebûl kir û lê xwudan derket û di midehê du salan da bi boşahîyeke gelek mezin pîroz kir. Îro bi reng û metodên nû zulma li ser zimanê Kurdî bi israr tête domandin. Di rewşeke wisa da xelkê me bi xwe bi şuûra li ziman xwudanderketinê ji KNKyê daxwaz kir ku rojek têra nake û rojên "Cejna Zimanê Kurdî" divêt bêne zêde kirin. Ji ber vê hewcehîyê,

www.arsivakurdi.org

îsal komisyona me, ”Komisyona Ziman, Perwerde, Çand û Hunerê ya KNKyê” ”Cejna Zimanê Kurdî” bi armanca dijî her reng asîmîlasyonê û parastina zimanê Kurdî û pêşvebirina ziman û perwerdeya Kurdî, derêxiste ”sê rojan” ku bi berfirehtir bête pîroz kirin û li ser giringîya ziman bi zanahîtir û berpirsiyarîtir bête rawestan. Ji îsal (2009) pêve ”Cejna Zimanê Kurdî” dê di rojên ”14 - 15 - 16ê Gulanê” da bi axivtin, şahî, resepsiyon, semîner, konferans û kombûnan bête pîroz kirin. Li seranserê Kurdistanê û meydanên dîasporayê, Kurd dê li goreyî şert û îmkanên xwe pîroz bikin û di nav aktîvîteyan da bin. Planê pîrozîya ”Cejna Zimanê Kurdî” jî bi vî rengî hatîye tesbît kirin:

**14ê Gulanê:** Destpêka pîrozîya ”Cejna Zimanê Kurdî” ye. Li ser zimanê Kurdî dê axivtin û şahî bêne kirin.

**15ê Gulanê:** Roja weşana kovara Hawarê ye. Hawarê ji bo parastin û jîyandina ziman û kultura Kurdî kedeke mezin daye. Ji ber vê yêkê, ji bo bîrînana kovara Hawarê dê rola wê ya di warê parastin û jîyandina ziman û kultura Kurdî da bête biha kirin û pîroz kirin.

**16ê Gulanê:** Ji bo giringîya perwerdeya bi zimanê Kurdî dê kombûn, semîner û konferans bêne kirin. Herweha ji bo xatiraya hemû şehîdên Kurdistanê, ku ji bo parastina ziman, kultur û hunera Kurdî, neteweyê Kurd û Kurdistanê canê xwe yê pîroz feda kirine, di roja dawîyê ya ”Cejna Zimanê Kurdi” da, dê hemû şehîdên Kurdistanê bêne bîrînan. Bi vê armancê xelkê Kurd dê bi gul û kulîlkan biçine ser av, çem û robarên Kurdistanê û wan qevdên gul û kulîlkan biavêjine nav av, çem û robarên Kurdistanê û rêzê li giyanê pak yê şehîdan bigirin.

Em hevî û bawer dikin ku xelkê me yê Kurd dê vê gava giring ya parastin û jîyandina zimanê Kurdî, wekî edetekî neteweyî pîroz bike û heta hetayê bidomîne. Em ji niha ve ”Cejna Zimanê Kurdî” ya neteweyê Kurd pîroz dikin.

**11**. Komisyona me, serkevtina di hilbijartinên şehridarîyan ya 29ê Adarê da hatîye bi destxistin jî bi giringî biha kir. Xelkê Kurd hem li Kurdistanê, hem jî li dîasporaya Tirkîyeyê serkevtineke balkêş bi dest ve îna. Em xelkê xwe û DTPyê pîroz dikin. Van hilbijartina îradeya Kurd û Kurdistanê dubare derêxiste meydanê. Em hêvî dikin ku ev mesaja xurt ya xelkê me dê ji teref yar û neyaran ve bête wergirtin. Lê belê, bi vê mijarê ve girêdayî em bi giringî li hêvîyê ne ku şehridarên Kurd, di hemû kar û xebatên şehridariyê da li goreyî şert û îmkanan rê li ber bi kar înana Kurdî xweş bikin û kursên her reng hunerîyê yên bi zimanê Kurdî ji bo ciwan û jinan vekin.

**12.** Hemû rêxistinên civakî-polîtîk, civakî-kulturî, civakî-aborî û dem û dezgehên dî yên Kurd û helbet pêkve Kurd, divêt di hatina vê qonaxa nû da zimanê Kurdî bêyî dudilî di hemû kar û xebat û têkilîyan da, di jîyana rojane da, bi berpirsiyarîyeke neteweyî bi kar bînin.

**13.** Kombûna vê carê ya ”Komisyona Ziman, Perwerde, Çand û Hunerê ya KNKyê” ya asayî rastî roja bûyîna rêberê PKK & KCKyê Abdullah Ocalan, 4ê Nîsanê, hat. Ocalan di nav hemû şertan da bi israr li ser giringîya zimanê Kurdî rawestaye û niha di nav wan çar dîwarên dîlîyê da jî vê mesaja xwe daîm digihîne xelkê Kurd ku bi kar înana zimanê Kurdî îhmal nekin. Bi vê munasebeta kombûna komisyona me ya îro, em roja bûyîna 60. ya Abdullah Ocalan bi dilgermî pîroz dikin û jê ra jîyekî dirêj û bi saxî û silametî daxwaz dikin û herweha daxwaza azadîya wî dikin.

**14.** Di encam da, komisyona me hewce dît ku li ser ”bazara girtina ROJ TV”yê jî gotina xwe bêje: Buroya rêvebir ya ROJ TV li Danmarkê ye. Reftara hukûmeta Danmarkê ya beramberî ROJ TVyê heta îro bi başî dom dike. Serokwezîrê Danmarkê Anders Fogh Rasmussen namzetê sekreterîya NATOyê ye. Tirkîye jî endama NATOyê ye û dixwaze vê pozisyona xwe dijî serokwezîrê Danmarkê bike mijara bazarê û bi vê fişarê ROJ TVyê li Danmarkê bide girtin. Em vê reftara dewleta Tirk rûreş û şermizar dikin. ROJ TV dengê xelkê Kurd e û di parastin û jîyandina zimanê Kurdî da roleke giring dileyize. Em hêvî û bawer dikin ku serokwezîrê Danmarkê dê li prensîb û huqûqa Danmarkê ya demokratîk xwudan derkeve û rê nade vê fişara hukûmeta Tirk.

www.arsivakurdi.org

# ENDAMÊN KNKê

1. Abdulbasit Mejax
2. Abdullah Sen
3. Abdurrahim Ayaz
4. Adem Uzun
5. Ahmed Resuli
6. Ahmet Çelik
7. Ahmet Dere
8. Ahmet Karani
9. Akif R.Wan
10. Ali Aksoy
11. Ali Demi
12. Ali Mator
13. Ali Qadir
14. Ali Yiğit
15. Amanc Heme Frec
16. Azer Ossi
17. Baban Saqızi
18. Baram Goran
19. Berzani Muhammed
20. Cafer Kerimi
21. Celal Bilgin
22. Celal Chwartayi
23. Celal Özkan
24. Cemal Shemoyan
25. Cemil Bayık
26. Diyar Garip
27. Durriye Avnî
28. Ehsan Naqşîbendî
29. Erol Polat
30. Eyyüp Doru
31. Faeq M. Ahmed
32. Fehmi Balayı
33. Felat Sumerkan
34. Felemez Başboğa
35. Ferhat Patiyev
36. Feride Abbasoğlu
37. Fevzi Özmen
38. Fidan Dogan
39. Fincan Suleymanova
40. Gazal Kızılboğa
41. Gelawesh Qadiri
42. George Aryo
43. Gönül Tepe
44. Govend Azeez
45. Gülizar Doğanay
46. Gulzar Dautova
47. Gundî Dilberz
48. Hacer Altınsoy
49. Halit Azizoğlu
50. Hasan Algunerhan
51. Hasan Nuhzetzade
52. Haydar Işık
53. Haydar Reshit
54. Heci Ahmedi
55. Heci Sileyman
56. Hesan Shetawi
57. Hevi Berwari
58. Hikmet Çetin
59. Hikmet Şimşek
60. Hiwa Golmuhamedi
61. H. Kasım Suleyman
62. Ibrahim Alipur
63. Ishkhan Ankosi
64. Ismail Geylani
65. Ismail Parmaksız
66. Jelal Kemalizadeh
67. Kahanum Mehmud
68. Kamiran M.Nabi
69. Katibe Ali Melek
70. Kazım Baba
71. Latif Takak
72. Leyla Pekoz
73. M.Emin Pencewini
74. Mahmut Kaya
75. Maşallah Öztürk
76. Mecid Heso
77. Mecid Melek
78. Medeni Ferho
79. Medya Aryan
80. Mehmet Yuksel
81. Melike Yaşar
82. Melle Şafi
83. Meyrem Muezini
84. Mirhem Yiğit
85. Mistefa Mûsa Etrûshî
86. Muhammed Agayar
87. Muhammed Suleyman
88. Mustafa Reshit
89. Muzaffer Ayata
90. Nahid Ehmedi
91. Nasır Resuli
92. Nazif Mayi
93. Necibe Qeredaxi
94. Nesimi Yaman
95. Nilüfer Koç
96. Niyazi Hamid İbrahim
97. Nizamettin Toğuç
98. Numan Oğur
99. Özcan Keldau
100. Özlem Tanrıkulu
101. Qadir Nadir
102. Rashidov M. Azizoviç
103. Refiq Gafur
104. Remzi Kartal
105. Rewşen Zılfo
106. Rojan Hazım
107. Ronak Osman
108. Roza Pınar
109. S. Moustafa Mizor
110. Sakine Cansız
111. Salam Omer
112. Saren Azer
113. Şemsettin Aktaş
114. Şemsettin Kara
115. Seyf Bedirxan
116. Shler Emini
117. Şiwan Jaff
118. Siyamend Moini
119. Şoreş Reşi
120. Sühelya Qazi
121. Süleyman Demir
122. Süleyman Günyeli
123. Suna Tunç
124. Tahir Eldemir
125. Tahir Kemalizade
126. Tariq Hemo
127. Teybet Tunç
128. Xalil İbrahim
129. Xerib Cemil Eli
130. Xıdır Meresena
131. Yakup Bersawmo
132. Yılmaz Orkan
133. Zerdeşt Haco
134. Zhenya Amiran